# RÊZIMANA KURDÎ

## AMADEYÎ

## 3

*Ev pirtûk ji aliyê Komîteya Ziman û Perwerdê ya KCK'ê û komisyona taybet ya ziman û perwerdeyê ve, weke pirtûka waneyê hatiye pejirandin.*

# AMADEKARÊN PIRTÛKÊ

## Komisyona ziman ya berê pirtûk amade kirîn

M. Şîrîn Çetîn, Mazlum Tekîn

Ji aliyê Komîteya Ziman û Perwerdeya KCK'ê ve komîsyonek taybet ji bo nûkirin û sererastkirina van pirtûkan hatiye damezrandin:

### Komîsyona nûkirin û sererastkirina pirtûkan

Mazlum Tekîn, Mizgîn Egîd, M. Şîrîn Çetîn, Dijwar Botan, Kewzer Kaçan

### *Redaktasiyon û Venêrîna Pirtûkê*

Mazlum Tekîn, Mizgîn Egîd, Sedîq Benek, Dijwar Botan,

### Mîzanpaj, rûpelsazî, sererastkirin û berhevkirina wêneyan


Bedredîn Oy

*Çapa pêşîn: 2003*
*Çapa nû: 2013*

**Ev pirtûk; ji aliyê Desteya Perwerde û Fêrkirinê ve, weke pirtûka waneyê hatiye pejirandin.**

**Email: s.m.kurdi2014@gmail.com**





*"Zimanê me bingehê netewa me pêktîne, divê em biparêzin û pêş bêxin."*

# NAVEROK

**BEŞA 1.** ........................................ **9**

BIREPEYV ........................................ 9
1-PALVEDARIYA NAVAN ........................................ 11
*a-Taybetmendiyên Palvedariyan Navan* ........................................ *12*
*b-Cûrên Palvedariya Navan* ........................................ *14*
2-RAVEKA HEVALNAVAN ........................................ 17
*A-Taybetmendiyên Raveka Hevalnavan* ........................................ *17*
*B- Di Hevokê De Erkê Ravekan Hevalnavan* ........................................ *19*
3- BIREPEYVÊN DUBARE ........................................ 20
*a) Danasîna Birepeyvên Dubare* ........................................ *20*
*b-Erkên Birepeyvên Dubare:* ........................................ *22*
4-VEQETANDEK ........................................ 24
*Beşên Veqetandekan* ........................................ *25*
5-TEWANG ........................................ 27
6-BIRÊN ALAVAN ........................................ 30
A- BIRÊN ALAVÊN DAÇEKÎ ........................................ 31
B- BIRÊN ALAVÊN GIHANEK ........................................ 33
TAYBETMENDIYÊN BIRÊN GIHANEKAN ........................................ 34
C- BIRÊN ALAVÊN BANGKIRINÊ ........................................ 35
D- BIRÊN ALAVÊN MERCÎ ........................................ 38
7- BIRÊN NASNAVAN ........................................ 39
8- BIRÊN JIMARAN ........................................ 41
9- BIRPEYVÊN KURTKIRÎ ........................................ 43
TAYBETIYÊN BIREPEYVÊN KURTKIRÎ ........................................ 44

**BEŞA 2.** ........................................ **46**

B-ENDAMÊN HEVOKAN ........................................ 46
A-ENDAMÊN HEVOKA KARÎ ........................................ 48
I-KAR ........................................ 48

KAR LI GOR ÇÊBÛNA XWE DIBE SÊ BEŞ: ........................................ **52**

*Cûrên karên hevgirtî* ........................................ *54*
II-KIREK ........................................ 55
CÛR Û BIREPEYVÊN DIBIN KIREK ........................................ 59

LIHEVHATINA KAR Û KIREKÊ ........ 60
*III- PÊKIR ........ 62*

4- TÊRKER ........ **68**

*1- Têrkerên Hevalkarî Yên Demî ........ 70*
*2-Têrkerên Hevalkarî Yên Rewşî ........ 70*
*3-Terkerên Hevalkarî Yên Cih û Ber ........ 71*
*4-Têrkerên Hevalkarî Yên Çendî........ 71*
*5- Têrkerên Hevalkarî Yên Pirsyarî........ 72*

C- TÊRKERÊN CIHÎ........ **73**

B-ENDAMÊN HEVOKA NAVDÊRÎ ........ 73
ENDAMÊN JI DERVEYÎ HEVOKÊ ........ 73

**BEŞA 3. ........ 73**

1- HEVOK LI GOR CÛRÊ KAR Û REWŞÊ........ 73
CÛRÊN HEVOKAN ........ 73
*a- Hevoka Navdêrî (Saloxî) ........ 73*
*b- Hevoka Kiryarî ........ 73*
*2- HEVOK LI GOR WATEYA XWE ........ 73*
*3- Hevok Li Gor Çêbûnê........ 73*
*1-Hevokên Hevgirtiya Mercî ........ 73*
*2-Hevokên Hevgirtiya Di nav Hev De ........ 73*
4- HEVOK LI GOR CIHÊ KAR Û SALOXÊ ........ 73

**BEŞA 4. ........ 73**

ÇARESERKIRINA HEVOKAN ........ 73

**BEŞA 5. ........ 73**

DESTÛRÊN NIVÎSÎNÊ Û HÊMADANÎNÊ ........ 73

# BEŞA 1.

## BIREPEYV

### XEBATÊN AMADEKARIYÊ

**Em hemû dizanin, ji bo her yek tiştê em li derdorê dibînin, bûyer û hizirîna peyvek wan dide nasîn heye. Lê belê ev peyv, di her demî de hest û hizrên me bi awayek tekûz nadin diyarkirin. Mînak, dema mirov bêje: "Derî" pêwîst e mirov bihizire ev deriyê xanî ye, yê baxçe ye, yê mêvanxanê ye, yê tirambêlê ye yan jî yê refê ye. Birên peyvan vê nediyariyê ji holê radikin. Deriyê refê, deriyê mêvanxanê... diyar dikin.**

## ROJEK YA ÎLONÊ

Roja 13'ê Îlonê bû, dihat xwestin em bên dibistanê û em nirxandinên sala perwerdê bikîn. Perwerda xwe bidîn destpêkirin.. Dil dixwest Şehîd Jiyan jî di nav me de bûya. Wê demê Jiyana heval wê li ser girîngiya perwerdê baxiviya. Wê rûmeta şehîdan bi me bida têgihandin, wê rastiya îxanetê bi awayekî vekirî bidaya diyarkirin.

Di parçeya jor de peyvên “Îlon, Jiyan, perwerde, şehîdan, îxanet” birepeyvek, bi peyvên roj 13 heval, girîngî, rûmet û rastiyê re çêkirine. Ev birepeyv, hestê ji bo têgihandina wateyekî û cudabûna wê ji yên weke wê, di birepeyva rûmeta şehîdan de, wateya peyva rûmet bi peyva şehîd hatiye diyarkirin. Her wiha daye diyarkirin kû peyva bingehîn rûmete. Peyva şehîd jî peyva alîkare. Yanî armanc, danasîna rûmetê ye. Bi peyva şehîd daye kifşkirin.

**Birepeyvên din jî di heman rewşê de ne.**

*Ji yekîneyên ziman yên ji peyvekê zêdetir, ji ber ku di hêla têgihandinê de girêdana wan bi hev re heyî, di hevokê de wekî endamekê tê destgirtin re **birepeyv** tê gotin.*

Di palvedariya navan de, peyva yekem temam dibe, peyva duwem jî temam dike.

Lê di ravekên hevalnavan de,dema veqetandek neyê bikaranîn û raveker bê pêşiya raveberê wê demê peyva yekem temam dike ya duwem temam dibe.

Di mînakên jor de peyvên, weke “Îlon, Jiyan, xwe, perwerde, şehîd û îxanet” peyvên alîkar yên weke “rojek, sêzdeh,girîngî, rûmet û rastî” peyvên bingehînin.

Di vê rewşê de mirov dikare birepeyvan bi vî awayî jî nîşa bike:

**Mînak:**

| | |
|---|---|
| Rûmet a | şehîdan. |
| Endama bingehîn | Endama alîkar |

| | |
|---|---|
| Jiyan a | heval |
| Endama bingehîn | Endama alîkar |

## 1-PALVEDARIYA NAVAN

## XEBATÊN AMADEKARIYÊ

Di perwerdeya sala borî de hûn fêr bûbûn ku peyvên heyînan didin nasîn, ji wan re **nav** tê gotin. Mirovan ji bo heyînên zîndî û nezindî riyên kurt hilbijartine, ketine riyekê ku bikarin, her heyînekê bipeyvekê bidin nasîn.

**Mînak:**

Dar, av, xak, mêş…

Lê belê her demê navek tenê têra têgihandina hest, hizir, heyîn yan jî wateyên pêwîst nake. Ji navek dîtir alîkarî tê xwestin. Bi peyva **"mêş"** re, peyva "**hingivî**" tê bikaranîn, bi vî rengî daxwaz bi awayekî tam tê nasîn. Peyvên "**roniya rojê, kaniya masiya**" jî birepeyv in, bi vî awayî hatine peydakirin. Hûn jî navên du peyvan peyda bikin.

Niha jî helbesta jêr bixwînin.

***"Pir xweşikî mîna gula biharê***
***Pir xwerûyî mîna bayê êvarê***
***Pir zanayî weke Îsayê li darê***
***Weke Mihemmed neyarê te ji malê***
***Feleka xayîn ticar kêr me nayê***
***Ji ber zilma neyarê vê cîhanê***
***Ez nikarim werim nav deryayê***
***Ji ber wê ev qas xemgîn im lê wayê***
***Derdê minê pir giran e lê dayê***
***Cîhan berf e, bihara me qet nayê."***

### *DAXUYANÎ*

Di helbesta jor de, peyvên binê wan hatine xêzkirin dubare bixwînin. Dema em van navan bi tenê bixwînin, wê pir baş neyê têgihiştin. Ka em çi dixwazin û wê li pey hev pir pirs bên pirskirin. Ji bo em van zelal bikin, em bi navê “**gul”** re “**bihar**”, bi navê “**bayê”** re êvarê û bi navê "**neyar**" re jî "te" bikartînin. Ev weke palvedariya navan tê bikaranîn.

**Mînak:**

Neyarê vê cîhanê

| Neyar | ê | vê | cîhan | ê |
|---|---|---|---|---|
| Nav | V. | Hevalnav raveker | Nav raveber | P. palvedanê |
| | | Raveka hevalnavan | | |
| Palvedar | | Palvedêr | | |
| Palvedariya Navan | | | | |

## a-Taybetmendiyên Palvedariyan Navan

Di palvedariya navan de herî kêm dû nav, yan navek cînavek peyda dibin. Di nav wan de yê ku tê xwestin diyar bibe, navê diyarkiriye (tekûzkiriye) palvedêr wateya navê palvedar temam dike.

**Mînak:**

Dar a kevot ê

Nav V. nav P.p.

Palvedariya navan

Di vê palvedariya navan de, peyva “dar” palvedar, “kevot” jî palvedêr e.

1- Di palvedariya navan de, palvedêr pêwîst e nav yan jî cînav be, pêwist e veqetandek di nava wan de bê bikaranîn.

**Mînak:**

Av a deryayê
Palvedar V. palvedêr
Palvedariya navan

Neyar ê te
Palvedar V. Palvedêr
Palvedariya navan

**2-** Di palvedariya navan de, dibe ku ji yekê zêdetir palvedar yan jî palvedêr hebin.

**a-** Girş, rot , hesîr yên xanî “**Girş, rot, hêsîrê**” hîna peyva “**xanî**” nehatî girtin hatine destpêkirin. Li vir peyva “**Girş, rot, hêsîr**” palvedar û peyva **“xanî**” jî palvedêr e.

Di bingeh de palvedariya navan bi vî awayî ye:

“Girş, rot û hêsîrê xanî, ji ber her tim ziman kurtiyê dixwaze û ji ber palvedaran palvedêrek hevpar heye. Peyva xanî ya ku palvedariya tevaye carekê hatiye bikaranîn. Bi vî awayî axaftin hatiye kurtkirin. Palvedêra, pir palvedarên wî heyî, **palvedêra hevpar** tê gotin.

**b-**“Dara hinar, hêjîr, hirmî, bih, guhîj...” li vir palvedar “dar” û peyva “hinar, hirmî, bih, guhîj, hêjîr” palvedêr in.

Palvedara, pir palvedêrên xwe hebe, **palvedara hevpar** tê gotin.

**ŞIYARÎ:**

Dema veqetandek nekeve navbera navan, nabe palvedariya navan: “Şivhinar, marmasî, pelmêw” ev birepeyv nabin palvedariya navan. Dibin navên hevgirtî.

**3-** Dibe ku palvedariya navan bibe palvedar yan jî palvedêra palvedariyek din.

**Mînak:**

Qurmê dara guzê    yê    Newala Bestê.
Palvedar    Veqetandek    Palvedêr

## b-Cûrên Palvedariya Navan

Du cûrên palvedariya navan hene. Palvedariya navan ya diyar, palvedariya navan ya nediyar.

### 1-Palvedariya Navan Ya Diyar

Palvedariya Navan ya diyar veqetandeka "diyar" dikeve di navbera palvedar û palvedêrê de.

**Mînak:**

"Dara milê çi delal e,
Bayê avê tev de sar e."

Van palvedariya navan yên di helbesta jor de lêkolîn bikin.

**Mînak:**

Dar    a    mil    ê
Palvedar    V.Diyar    Palvedêr    P. Palvedanê
Palvedariya Navan ya Diyar

Ba    yê    av    ê
Palvedar    V.Diyar    Palvedêr    P. Palvedanê
Palvedariya Navan ya Diyar

Dema em temaşeyî van palvedariya navan dikin, dibînin ku di navbera palvedar û palvedêr de veqetandeka diyar hatiye bikaranîn. Ji ber wê ev palvedariya navan ya diyar e.

### 2-Palvedariya Navan Ya Nediyar

“Lehiyek rabû gelî temirand,
Darek ya hêjîrê ji nav zivirand,
Xaniyek yê me ji bin hedimand,
Berek yê xanî li nav gewiland,
Li ser wê de çû çira min temirand.”

Dema em temaşeyî helbestê dikin, dibînin ku palvedariya navan yên binê wan hatine xêzkirin palvedariya navan yên nediyar in. Ji ber veqetandeka nediyar bikaranîne.

Dema em dibêjin; “dara hejîrê” em têdigihin gelek cûrên daran li wir hene û yek ji wan dara hejîrê ye. Em dabaşa ji wê hejîra diyar dikin. Lê dema em dibêjin: “darek ya hêjîrê” em têdigihin ku gelek darên hejîrê li wir hene. Dema em dibêjin; "darek ya hêjîrê" em têdigihin ne dara gozê û ne ya hinarê ye. Lê dîsa kifş nabe kîjan dara hêjîrê ye.

**Mînak:**

| Darek | ya | hêjîrê |
|---|---|---|
| Nav | V. | Nav |
| Palvedar | | Palvedêr |

Palvedariya navan ya nediyar

### Têgehên Palvedariya Navan Ev in:

**a**-Palvedêr cûrê palvedar dide diyarkirin.

**Mînak:**

→ Marê masî
→ Boriya sopê

**b**-Palvedêr, palvedar ji çi çêbûye dide diyarkirin.

**Mînak**

→ Tirşika bacanan
→Şorba şîr

**c**-Palvedêr sedemê palvedar dide diyarkiririn.

**Mînak:**

→ Birîna kêrê

→Tengbûna bêhnê

**d**-Palvedêr, palvedar mînandiye çi dide diyarkirin?

**Mînak:**

→ Marê tîr,

→ Çiyagerê şêr.

**e**-Palvedêr erkê palvedar dide diyarkirin.

**Mînak:**

→ Cerê avê

→ Mêşa hingivî

→ Mirovê karmend

**ê**-Palvedêr dide diyarkirin ku ka palvedar bi kêrî çi karî tê?

**Mînak:**

→ Firça didanan

→ Torikê gelêş

→ Mêzê xwarinê

**f**-Palvedêr cihê palvedar dide diyarkirin.

**Mînak:**

→ Golopa eywanê

→ Masiyê deryayê

→ Gula çiya...

## PIRS

**1**-Bi van her du birepeyvên jêr hûn dikarin şeş palvedariya navan çêbikin?

| | |
|---|---|
| Dar | Dibistan |
| Heval | Dest |
| Parêzname | Çiya |
| Gul | Serok |
| Xwendekar | Hinar |

| | |
|---|---|
| Demjimêr | Bihar |

**2**- Li ser têgehên palvedariya navan mînakan saz bikin.

## 2-RAVEKA HEVALNAVAN

- Azadê hêja çû dibistanê.
- Xwendekara rêzdar name nivîsî.

Di nivîsîna jor de hin hevalnav hene. “**hêja, rêzdar**” van hevalnavan çawaniya navan dane diyarkirin. Birepeyvên ji nav û hevalnavan tên holê re **raveka hevalnavan** tê gotin.

Raveka, “**gelek masiyên zer**” bi vî awayî ye.

| | | | | |
|---|---|---|---|---|
| Gelek | masî | y | ên | zer |
| Hevalnav | Nav | t. s. | V. | Hevalnav |
| | Raveber | | | Raveker |
| | Raveka hevalnavan | | | |
| | | | | |

### A-Taybetmendiyên Raveka Hevalnavan

**1**-Weke li jor tê dîtin nav raveber, hevalnav jî raveker e.

**2**-Di raveka hevalnavan de, endam bêyî pêveka palvedanê bi hev ve tên girêdan. Ji ber hevalnav pêvekan nagirin. Veqetandek dikeve navbera nav û hevalnavan. Ger cînav bibe hevalnav zayenda nêr, mê û komê digirin.

**3**-Dibe ku navek ji yekê zêdetir hevalnavan bigire.

**Mînak:**

- Gula sor a çilmisî ji nû ve geş dibe.”
  N. hevalnav1 v hevalnav 2
- Raveka hevalnavan

- Egîdê leheng, dilovan, mêrxaz şehîd ket.

Nav H. nav 1 H. nav 2 H.nav 3

Raveka hevalnavan

- Vî dijminê xirab, çavsor, welat wêran kir.

H.Nav.1 Nav H. Nav.2 H. 3

Raveka hevalnavan

**4**-Dibe ku hevalnavek bibe ravekera gelek navan. Ev hevalnav jî dibe hevalnavê hevpar.

**Mînak:**

→ Pêwîst e cil, pêlav, pirtûk, pênûs,lênûsên nû ji xwendekaran re bên amadekirin.

Di vê hevoka jor de hevalnava “nû” hevalnava hevpar ya “cil, pêlav, pirtûk, pênûs û lênûsê ye.”

**5**-Di raveka hevalnavan de dibe ku endamek (nav yan hevalnav) yan jî her dû bi awayê birepeyvan bin.

## a- Dema hevalnav birepeyv bin:

**Mînak:**

- Zarokên pir xweş û jîr hene.

Birê gihanekan

raveker

Di vê hevokê de zarok nav e, birepeyva "pir xweş û jîr" hevalnave.

## b- Dema nav birepeyv bin:

- Dîwar ê xanî yê sor

Nav V. Nav V

Palvedariya Navan

Raveber Raveker

Raveka Hevalnavan

Di mînaka jor de, peyva "sor" hevalnav e, nav bi awayê palvedariya navan e.

### c- Dema nav û hevalnav her du birepeyv bin:

**Mînak:**

- Gul a dar a hinarê ya sor û zer ciwan e.

**Nav** **V.** **Nav** **V.** **Nav** V. H.1. h.2

Palvedar Palvedêr

**Palvedariya Navan**

Palvedar Palvedêr

**Palvedariya Navan**

Raveber Raveker

Raveka hevalnavan

## B- Di Hevokê De Erkê Ravekan

Raveka hevalnavan di hevokê de weke nav û hevalnav tê bikaranîn.

**Mînak:**

- **Kirek**: “Xwendekarên hêja gula sor birin.”
- **Pêkir:** "Ez pir têhnbûm, kulmek ava zelal neda min."
- **Têrker:** Wan di deşta rast de genim dirûn.
- **Salox:** Ew kulîlka şilêr ya sor û zer e.
- **Destpêk:** Deşta rast germ e.

## PIRS

**1**-Du ravekên hevalnavan li lênûsa xwe binivîsin û çareser bikin.

**2**- Dû ravekên hevalnavan yên hem hevalnav birepeyv bin hem nav birepeyv bin, li lênûsa xwe binivîsin û çareser bikin.

## 3- BIREPEYVÊN DUBARE

### a) Danasîna Birepeyvên Dubare

"Dema zivistan bi dawî dibe, bir bira avê di newalan de diherike, çîp çîpa firindeyên biçûk xemil û xêlê didin cîhanê. Piştî havîn tê, di germa havînê de fêkî dipijin, qenc-xirab carek din em dikevin peyîzê."

Li vir hûn dibêjin: "qenc-xirab" tê çi wateyê?

Ev birepeyv çawa hatiye bikaranîn?

Di nivisîna jêr de jî birepeyvên mîna van hene. Bixebitin da ku hûn taybetiyên çêbûn û wateyên wan fêr bibin.

"Kevok difirin, radibin li ser çiyayên bilind, hêlinên xwe yên xweşik çêdikin. Dubare dubare di heman hêlînê de ferxikên xwe derdêxin. Kêm zêde bi vî awayî jiyanekê derbaz dikin."

***DAXUYANÎ***

Di nivisandina jor de, her yek ji peyvên "dubare-dubare, bir-bir" bi heman peyvan hatine dubarekirin. Her yek ji van birepeyvên dubare re **birepeyvên dubare** tên gotin.

**1-** Ji bo wateya xurtkirin, nêzîk (kêm-zêde) pir zêde, bi hevrebûn û domandinê tên bikaranîn.

**Mînak:**

→ Xurtbûn: Qiç-qiça ron bû, dişewitî.

→ Nêzîk: Pirsgirêka Kurd kêm zêde ketiye rojevê.

→ Pir zêde: Leşkerên dewleta Tirkan tên mîna roviya beqê neserî nebinî ye.

→ Bihevrebûn: Me berê xwe da çiyê, rabûn rûniştin, me nezanî, em çawa çûn çiyê?

→Domandin: Min dît kalek pîremêr hat mala me, hinekê xemgîn xuya dikir, ji bo wî ez êşam. Piştre serpêhatiya xwe dirêj dirêj ji min re vekir.

**2**-Birepeyvên Dubare: Dubarekirina heman peyvê, avakirina bi hev re, karanîna peyvên nêzik wate yan dijwate, yan bi zêdebûna "m" yê tên sazkirin.

**Mînak:**

**→ Dubarekirina heman peyvan:**

“Giran-giran tu biçî li ser, ser û çavên min,
Xem û xiyal her tuyî, ti car naçî ji bîra min.”

“Ger bi awayekî hovane êrişên li ser gelê me berdewam bikin, wê gelê me dubare dubare xwe biparêze.”

**→ Dubarekirina peyvên nêzîk wate:**

Peyvên di hêla awayê wateyê de nêzik hev in, tê dubarekirin:

**Mînak:**

- Wan hevalan rastî duristî parastin.

“Neyarên hov, bi awayekî hovane, bi awayekî eşkere neveşartî dixwazin Kurdan tine bikin.

**→ Dubareyên Dijwate:**

**Mînak:**

“Dur nêzîk bi te bawer im.
Hevala min a zana, kêm zêde.
Bi destê te ye kevoka li ser bana.”

**→ Dubareyên bi “m” yê**

Peyvên bi dengdêran tên destpêkirin, rasterast, peyvên bi dengdaran tê destpêkirin, “**m**” dikeve şûna tîpa destpêkê û tîpa destpêkê dikeve.

**Mînak:**

- Heval meval
- Av mav

- Tişt mişt

Peyvên bi tîpa **“m”** yê tên destpêkirin, dubareya wan bipeyva filan tê çêkirin.

**Mînak:**

→ Hinek masî filan ji me re bîne.

## b-Erkên Birepeyvên Dubare:

Di hevokê de birepeyvên dubare, dibe nav, hevalnav, hevalkar yan jî dibin salox.

→ **Pêkir:**

“Ji te hezdikim, li min meyzêne,
Bi pera mera xwe nexapîne,
Ji te narevim dilê min zêr e.”

→ **Têrker:**

“Yara mina rast durist, di riya min de maye,
Dil û hinav bûne pêt, di nav baxê gula ye.”

→ **Têrker:**

“Li pêş paş binêre çima her wa ye,
Li alekî şahî yê din winda ye.”

→ **Salox:**

“Banê me dar mar e,
Ya min dîtî yar e.”

→ **Kirek:** Mirovên rast durist tên hes kirin.

→ **Destpêk:** Pênûs mênûsên me xweşik in.

# PIRS

**1**-Li ser birepeyvên dubare sê mînakan saz bikin.

**2**-Bire peyvên dubare yên ku we diyarkirine, çêbûna wan lêkolîn bikin.

**3**-Gelek birepeyvên dubare, peyva wan ya duwem hatiye dayîn, peyva yekem ya ku li van were, bibînin û birepeyvên dubare sazbikin?

..........miya
..........zêde
..........dubare
..........mirist
..........mêx
..........milan

## 4-VEQETANDEK

# XEBATÊN AMADEKARIYÊ



Rojek ya biharê du hevalên şoreşger di nava darên kesk de rûniştibûn. Xêrxwazek yê gundî hinek nanê tenûrê û penirê derfa tîne û bi hev re xwarina xwe dixwin, piştî xwarinê dixwin şoreşgerê bi navê Ziya hûrikê nan û penîr kom dike û berdide nava agirî, li ser wê şoreşgerê bi navê Xoce pir bi hêrs dibe û dibêje: "Tişta we kirî nerast bû, ji ber pir firinde, mîna me birçî ne, ew mafê wan bû, te avêt nava agir."

Ziya: "Ew mafê şoreşgera ye, kesê şoreşger mafê xwe ji nav agir derdêxin. Firindeyên şoreşger bin yê xwe bavêjin nav agir, mafê xwe derxin û bixwin. Yê neşoreşger bin, mafê wan di xwarina şoreşgeran de tine."

***DAXUYANÎ***

Hevokên di mijara jor de, yên ku binê wan hatine xêzkirin, di hevoka destpêkê de "rojek ya biharê" palvedariyek ya nava ye. Tişta ku wan herdu navan bi hev re dide girêdan çi ye? Di navbera peyva "rojek" û peyva "biharê" de veqetandeka "ya" heye. Vê veqetandekê jî daye diyarkirin ku roj ya biharê ye û bi vî awayî jî peyva biharê kiriye palvedêr.

Di hevoka duwem de "hevalên şoreşger" û birepeyvên mîna wê birepeyvên girêdayî hev in.

Navê veqetandek pêre hatî û nav yan navên li pey wê tên û bûyîn bir, ji wan birepeyvan re **birên girêdayî** hev tê gotin.

## Beşên Veqetandekan

***Veqetandek dibin dû beş:***

**a-Veqetandeka nêrza**

**b-Veqetandeka mêza**

Nêrzatî û mêzatiya van veqetandekan li gor palvedar tên diyarkirin yanî ger palvedar nêr be, veqetandek nêrza ye, ger mê be, mêza ye. Di zimanê Kurdî de, veqetandeka mê **"a"** ye. Ya nêr jî "**ê**" ye.

Dema ku palvedar bi tîpa dengdêr bi dawî bibe, tîpa siwar "y" li ser veqetandekên hatin diyarkirin tê zêdekirin.

Ger palvedar kom be, ji bo nêr û mê "**ên"** tê bikaranîn.

Dema palvedar nediyar be, ji bo nêr ji bo mê "**î", "e"** tên bikaranîn. Di komê de "**in", "ne**" tên bikaranîn.

Li gor van mînakên li jor bi awayê pêşdarî li jêr hatine diyarkirin.

| Xwarin | a | xweş |
|---|---|---|
| Nav palvedar | Veqetandeka diyar û mê | Hevalnav çawaniyê |

| Kopal | ê | stûr |
|---|---|---|
| Nav palvedar | Veqetandeka nêr ya diyar | Hevalnavê çawaniyê |

| Gul | ên | sor |
|---|---|---|
| Nav | Veqetandeka kom | Hevalnavê rengdêr |

| Gul | ek | î | sor |
|---|---|---|---|
| Nav | Pêveka nediyarbûnê | Veqetandeka nediyar ya nêr | Hevalnavê rengdêr |

| Gul | ek | e | sor |
|---|---|---|---|
| Nav | Veqetandeka nediyar | Pêveka Veqetandekê | Hevalnavê rengdêr |

Mînakên din yên palvedariya navan jî wekî mînakên derbazbûyî têne çareserkirin.

**PIRS**

Di nivîsînên jêr de veqetandeka bibînin. Kîjan di navbera palvedariya nav, kîjan di navbera raveka hevalnavan de û kîjan wekî cînav hatiye bikaranîn? Bidin diyarkirin.

**a**-Hêviya gelê me bi mirovên leheng ve girêdayî ye.

**b**-Dermanê nexweşiyê bawerî ye.

**c**-Yê mêrxaz li hemberî tevayî zoriyan rûmeta xwe diparêze.

**d**-Mirinekî birûmet ji jiyanekî bêrûmet çêtir e.

**TÊBÎNÎ:**

Veqetandek li milekê girêdana di navbera palvedar û palvedêr de çêdikin. Li milekê din nêr û mê, diyarbûn û nediyarbûna palvedar didin diyarkirin.

**5-TEWANG**

## XEBATÊN AMADEKARIYÊ

"Di sal 1984'an de Hevalê Egîd bi hêzekî pir xurt li ser neyaran de çû, tirsek mezin xist nava neyaran û gelê Kurd şiyar kir. Ji nû ve gelê Kurd ji xew rabû û gelek Egîd derxistin lê yên wekî wî Egîdî hêj nehatine dîtin. Riya wî Bêrivanê da domandin, niha dibe Egîdekî nû, Bêrivaneke nû derkevin û riya wî lehengî û wê lehengê bidomîne. Gel wê, wan bi gulan pêşwazî bike, wê demê ewê gulekî danin ser gora Egîdî û Bêrivanê jî.

***DAXUYANÎ***

Peyvên di mijara jor de, binê wan hatine xêzkirin, bi baldarî bixwînin. Peyva destpêkê ya binê wê hatî xêzkirin "Egîdî" pêveka zayenda nêr girtiye. Ji ber wê em dibêjin Egîd nêrza ye. Peyva duwem ya ku binê wê hatî xêzkirin, "Bêrîvanê" em dibînîn peyva "**Bêrîvan" jî** pêveka zayenda mê **"ê"** girtiye. Ji ber wê em dizanin ku ev peyv ji bo heyînek mêza hatiye bikaranîn.

Dema em temaşeyî mînakên derbazbûyî dikin, têdigihin ku di zimanê Kurdî de, du cûrên zayendan hene. Ya yekem zayenda nêrza û ya duwan jî zayenda mêza ye.

Dîsa dema em temaşeyî peyva "gulan" dikin têdigihin ku zayenda nêrza û mêza pêveka "**an**"e. Lê dema kesên behsa wan tê kirin nediyar bin, wê demê ew nav zayenda nediyar "**na**" digirin.

**Mînak:**

Gulna bîne.

Ger navê mijara gotinê gumanza be, em, cînavên nişandanê li pêşiya wî/ê bikartînin. Bi vî awayî em nêr û mêyîtiya wan fêr dibin. Li gor wê zayenda nêrza yan mêza li ser navan zêde dikin.

**Mînak:**

- Vî berî ji min re bîne.
- Vê gulê biçîne.

Ev her çar cûrên zayendên dabaşa wan hatî kirin, çêbûna wan bi vî awayî ye.

| Gul | ê | pirtûk | xwend. |
|---|---|---|---|
| Navek mê û kirek e | Zayenda mêza ye | Navê mêza ye, pêkir e | Kar |

Hûn jî mînakên jêr wekî ya jor li gor zayenda wan çareser bikin.

| Xwendekar | î | mijar | xwend. |
|---|---|---|---|
| Navekî nêrza û kirek | Z. nêrza | Nav e, Pêkir | Kar |

| Heval | an | aşitî | pêkanîn. |
|---|---|---|---|
| Nav e, kirek | Z. nêr mê diyar û kom | Nav e, pêkir | Kar |

| Heval | na | şaşî | kirin. |
|---|---|---|---|
| Nav e, kirek | Z. nêr. mê nediyar û kom | Nav e, pêkir | Kar |

## PIRS

Li mijarên jêr temaşe bikin û zayendên ku di wan de heyîn bibînin û cûrê wan bidin diyarkirin.

**a**- Ger em ji şehîdê xwe re nerêzdar bin û şehîdî bi bîr neynîn, em nikarin serbikevin.

**b**-Mirov mîna darekê ye, dara bêsih ti kes li binê wê darê naraweste.

**c**-Darên çiyayên me, pelên xwe werandine lê darna pelên xwe newerandine.

**d**-Jin bûn hêz û jinan li her derê komeleyên xwe vekirin.

# 6-BIRÊN ALAVAN

## XEBATÊN AMADEKARIYÊ

"Ji derdê te ezê dîn im,
Şev û rojê di xiyalê de,
Bihar borî, havîn jî hat,
Dilê min hêj di qeydê de.
Dilê min hêj birîndar e,
Mal jî çûye, mam bêwar e,
Banî dikim hey hewar e,
Ji ber derda dil bû par e."

**NIRXANDIN**

Di mijara jor de, peyvên binê wan hatine xêzkirin, têkîliyên wan bi navên bi wan hatin re hene lê di navbera peyva beriya xwe û ya piştî xwe re, di hêla wateyên cûrbecûr de têkîliyek avakiriye.

Peyvên di mînakên jor de, derbazbûyîn yên weke “di” di navbera roj û xiyalê de yên weke “jî” di navbera "havîn û hat" de têkîlî afirandine.

*Dema bi navekî yan bi komek navan re alav tên jê re **birên alavan** tê gotin.*

Çêbûna birê alavan bi vî awayî ye:

| **Ez** | **di** | **mal** | **de** | **rûniştîbûn.** |
|---|---|---|---|---|
| **Cînav** | A.Daçekî | nav | paşdaçek | **kar** |
| **Kirek** | Birên Alavî | | | |
| | **Têrker** | | | |

Di zimanê Kurdî de, alav wiha rêz dibin:

**a- Birên alavên daçekî**
**b- Birên alavên gihanek (girêdanê)**
**c- Birên alavên bangkirinê**
**d- Birên alavên mercî**

## A- BIRÊN ALAVÊN DAÇEKÎ

Çar birên alavên daçekî hene.

**1- Di:**

"Di dil de ez birîndar bûm,
Pir zelîl û perişan bûm,
Lê dîsan ez hêvîdar bûm,
Lewma bûme penaber."

**2-Bi**

"Bila çiya tim bilind bin,
Li alek dar yek kevir bin,
Bi daran ve hemû gul bin,
Da bibînin lezetê."

**3-Ji**

"Ji par ve ez dihizirim,
Çima cîhan belav e,
Li dora xwe dizivirim,
Neyar ketiye nav e."

**4-Li**

"Min dît li ser rê re meşî,
Bêhna gulê jê diweşî,
Çavreş çima tû dilgeşî,
Ji min re qet nîne jiyan."

Dema temaşeyî mijarên jor dikin, dibînin ku alavên daçekî bi navan re bûne watedar û ji bo tekûzkirina wateya wan, bi dawiya navê wan ve paşdaçekên wan hatine bikaranîn.

Lê daçeka "li" piraniya caran bê paşdaçek tê karanîn.

Ev alavên daçekî, dema ku dikevin beriya cînavan gelek caran, ew û cînav bi hev ve tên zeliqandin, kurtkirin û weke peyvekî têne bikaranîn. Lê di wê rewşê de tîpa **"d"** dibe **"t"** û tîpa "**b"** cihê xwe ji **"p**" yê re berdide.

Ji bilî daçeka "di" yê daçekên din dema bi cînavan re tên bi hev ve zeliqandin yan nezeliqîn, carna pêwîstî bikaranîna paşdaçeka wan nayê dîtin.

## PIRS

**1**-Ji bo her yek ji van daçekan re mînakekî paşdaçek, bi daçekê re hatî bikaranîn û mînakekî paşdaçek nehatî karanîn binivîsin.
**2**-Alavên daçekî bidin nasîn?

## B- BIRÊN ALAVÊN GIHANEK

## XEBATÊN AMADEKARIYÊ

Mîna birên alavên daçekî, birên alavên gihanek (girêdanê) jî hene.

Peyvên weke "jî, ku, û hwd..." alavên girêdanê ne.

-Viyan jî çû, azad hêj nehatiye.

-Nêrgiz û Nermînê pirtûk xwendin.

### NIRXANDIN

Di herdû hevokên jor de, peyva **"jî, û"** bi kîjan peyvan re, birên gihanekan çêkirine.

Di sala borî de hûn fêr bûbûn ku alavên gihanek di navbera dû peyvên yek komê yan jî di navbera dû peyvên di heman erkî de girêdanê çêdikin.

Niha jî peyvên ku bi alavên gihanek bi hev ve tên girêdan hene.

Dema hûn benda jêr dixwînin balê bikişinin li ser gihanekan û bizanin ka kîjan birepeyvan çêdikin.

"Di dîrokê de jinên Kurd, zimanê xwe parastine û tevlî gelek lehengiyan jî bûne. Dema zorî yan nexweşî di nav civakê de didîtin, ji bo çareseriyê diketin rê."

Li jor hinek alavên girêdanê derbaz dibin, peyvên girêdanê ne: **"û, ku, jî, lê, belê, yan"** dema em temaşeyî jor dikin, dibînin ku peyva **"jî", "û"** girêdan dane çêkirin. Alava **"yan"** jî zorî û

nexweşî bi hev ve girêdan e. Dema dû nav yan zêdetir nav bi gihanekan bi hev ve tên girêdan, ji van birêpeyvan re, **birên gihane**k tê gotin.

**Mînak:**

Pênûs û lênûs

Çêbûna birên gihaneka bi vî awayî ye:

| Pênûs | + | û | + | lênûs |
|---|---|---|---|---|
| Nav | | Gihanek | | nav |

Birên gihanekan

## Taybetmendiyên Birên Gihanekan

**1-**Birên gihanek bi gihaneka bi hev ve tên girêdan.

Û: Egîd û Gabar çûn çiyê.

**Birên gihanekan**

Ev birên gihanekan kirek e.

Yan: Dema kesek hat pirtûk yan lênûs di dest de be jê bistînin.

Hem: Egîd hem zana hem mêrxaz bû.

Lê belê: Egîd hat lê belê Mazlum nehat.

Jî: Mar jî hat, masî nehat

**2-**Dema birên gihanek ji du peyvan zêdetir bin, gihanek dikeve navbera herdu peyvên dawî, di navbera peyvên din de bêhnok tê danîn.

**Mînak:**

Çiya, Hogir, Baran û Zozan çû dibistanê.

**3-** Birên gihanekan dibe ku bibin endamê hevokê.

**Mînak:**

Evîna dirêj û zirav hat dibîstanê.

**4-**Di birên gihanekan de lêdana her peyvekê dikeve li ser wê bixwe.

**Têbinî:** Dema gihanek dikevin navbera hevokan, birên gihanekan çênakin. Belkî hevoka hevgirtî derdixin holê.

**Mînak**: Derya çû dibistanê û zivirî.

**PIRS**

P1- Di benda jêr de, birên gihanekan bibînin û erkê wan yê di hevokê de bidin diyarkirin.

Hezin Kurdî, li ser niştimanperweriyê, pexşan yan helbest nivisîne.

## C- BIRÊN ALAVÊN BANGKIRINÊ

## XEBATÊN AMADEKARIYÊ

Di zimanê Kurdî de, birên alavên bangkirinê jî hene. Peyvên weke “**wa, ya, ha, ey, wax**" û hwd. alavên bangkirinê ne.

Di perwerdeya sala borî de hûn fêrî peyvên bangî bûbûn. Hinek peyvên bangî ji rewşa merg tên; hindek jî ji bo pêhes û bangkirinê tên bikaranîn.

Peyvên di gel bangan têne bikaranîn, hûn dizanin di hevokê de kîjan endam in?

**Mînak:**

Ha serokê min, wa Rêberê min
Ya Xudanê min, ka hêviya min

Di malika we xwendî de, peyvên binê wan hatine xêzkirin alavên bangkirinê ne.

Her wiha, di mijara jêr de jî hûnê birêpeyvên ji peyvên bangî û navan pêkhatî bixwînin. Hûn bixebitin da fêr bibin, ka çêbûn û erkê wan yê di hevokê de bi çi awayî ye?

Ey dayîka şehîd! Histirên çavên we, dilê me têşînin.

Wa dîrok! Heya tû me nasnekî, emê te nasnekin.

## DAXUYANÎ

Peyvên weke, “ey dayîka şehîd, ,” wa dîrok" yên ku di rêzika jor de derbas bûyîn, peyvên bangî ne.

**Çêbûna birepeyvên bangî bi vî awayî ye:**

| | |
|---|---|
| Ey | dayîka şehîdan |
| P. Bangî | Palvedariya Navan |
| Birepeyvên Bangî | |

**Mînak:**

"Ey dijminê me yê har!
Tu  bes bike barebar
Em vê dozê bernadin
Eger esman jî bê xwar."

## Taybetiyên Birepeyvên Bangî

**1**-Ka çawa dibe bang, li paş û pêş dû caran bê dubarekirin. Dikare li gor bangekî jî werin.

Wa dayê way! Çima agir ket dinyayê?

Li vir bang "wa" hatiye dubarekirin.

Wa, wa dayê! bê te xewa me nayê.

Li vir herdû bang bi hev re hatine.

**2**-Bangkirina peyvan, bang di tê de nebe jî, birên bangan tên hesibandin.

**Mînak:**

Bijî kurê minê hêja! Şêrê bi tenê!

**3-**Birên bangan nabin endamê hevokê. Ji ber bang di bingeh de tê naskirin. Endamê ji derveyê hevokê ne.

**4**-Lêdana birê bangan li ser peyva bangê yê.

## PIRS

Mijarên jêr bi baldarî bixwînin û birê bangan peyda bikin.

-Min zanî tu yan pîrî yan jî kalî.

-Ey welat! Ezê te ji xwe re bikim yar, ezê xwe bikim pal û mertal.

Ey hêviya gelê me!

## D- BIRÊN ALAVÊN MERCÎ

## XEBATÊN AMADEKARIYÊ

Alavên mercî jî weke yên din girêdana wan bi navan re heye. Peyvên weke **"ger"** divê mijarê de weke alav tê bikaranîn.

-Ger tû neçûbayî ew ê bihata.

-Heke Xebat bihata ew jî nediçû.

### DAXUYANÎ

Di herdû rêzikê we xwendî de, peyva binê wan hatine xêzkirin alavên mercî ne. Dema alavên mercî tên bikaranîn, pêwîst e li pey birepeyvên alavî re merc û seza werin yanî di heman demê de hevokan bi hev ve girêdide.

### PIRS

**1**-Li ser alavên mercî du mînakan sazbikin.

**2**- Birên alavên we dîtî, erkê wan yê di hevokê de bidin diyarkirin.

3- Çend alavan di nav hevokê de bikarbînin?

## 7- BIRÊN NASNAVAN

### XEBATÊN AMADEKARIYÊ

Demê hûn kesekê mezin yan jî bi mirovekê xwe re daxivin, berî nav hûn peyvekî rêzdarî yan mirovatiyê dide diyarkirin, bikartînin? Peyvên weke **“mam, kak, xanim, serok, xwişk**...” di nav hevokê de dibin nav yan jî hevalnav? Di mijara jêr de, navê bi vî awayî peyda dibin? Bendê bi baldarî bixwînin.

*“Demê Partiya Karkerên Kurdistan hat damezrandin berxwedan hat berdewamkirin.*

*Ji bo pêşxistina vê berxwedanê, gelek lehehgên weke; “**Şehîd Mazlum, leheng Kemal, Fermadar Egîd**” canê xwe gorîkirin û berxwedan pêşxistin. **Bi rêveberiya Rêber Apo** vê berxwedanê xwe gihandiye roja me.”*

### *DAXUYANÎ*

Di benda we xwendî de, peyvên weke: “şehîd, fermandar, leheng” yên ku li pêşiya navan hatine, pêwîst e bala we kişandibin. Ev peyv nasnav in. Hinek pile, hinek jî ji bo rêzdariyê ne.

Peyvên ji nav û nasnavan yan jî navê mirovatî pêkhatî re **birên nasnavan** tê gotin.

**Mînak:**

| | |
|---|---|
| Şehîd | Mezlum |
| Nasnav | nav |

**Birê nasnavan**

Fermandar   Egîd
Nasnav   Nav
**Birên nasnavan**

**Mînak:**

Xwarîna wan, Yadê Gulê çedike.
Fermandar Rustem Cudî hêza me birêve dibe.
Mam Aram pir ji hunerê hesdike.
Yabo Dara, zarokan baş perwerde dike.

Di van mînakan de, peyvên binê wan hatine xêzkirin yên weke "Yadê Gulê, Fermandar Rustem Cudî, Mam Aram, Yabo Dara û weke din... dibin birên nasnavan. Birên nasnavan weke nav dikarin bibin yek ji endamê hevokê. Weke di mînakên jor de jî tê dîtin, dibe ku bibin kirek, destpêk û têrker jî.

**PIRS**

1-Birên nasnavan di hevokan de dikarin kîjan erkan bigirin? Diyar bikin.

2-Çima birên nasnavan tên bikaranîn?

## 8- BIRÊN JIMARAN

### *XEBATÊN AMADEKARIYÊ*

Hun dizanin, di zimanê Kurdî de navên jimaran bi çend awayan tên? Ya yekem weke yek, du, sê, pênc, heft, sed, hezar bi yek peyvê, bi hevalnavê jimara bingehîn raveka hevalnavan çawa ye? Hûn dizanin, birên jimara tê çi wateyê? Di mijara jêr de ya ku hevalnav jimara bingehîn e, navê jimara yên ku bi awayê raveka hevalnavan û birê jimara hatî avakirin hûnê bixwînin. Balê bikişînin ji bilî raveka hevalnav, birên jimaran çawa hatiye damezrandin?

Şoreşa me bi jimarek biçûk dest pê kir. Li cihna dû kes, li milna çar kes tevlî bûn. Bi vî awayî jimara hêza me zêde bû, giha pazde hezar, nehsed û not yekî. Di Newroza Amedê de nêzî pazde hezar, nehsed bist û yek kes hatibûn gel hev.

### *DAXUYANÎ*

Weke di jor de, hatî bîranîn peyvên weke “yek, du, sê” hevalnavên jimarî yên yek peyv in. Yên weke “pazde hezar, neh sed...” jî bi awayên raveka hevalnav ya navên jimara ne. Di van de jimara biçûk li pêş û jimara mezin jî li dawiyê ye. “pazde hezar, neh sed bist û yek” ev jî bi awayê birê jimaran, navê jimara ne. Dema em birên jimara lêkolîn dikin, dibînin ku jimara mezin li pêş, jimara biçûk li dawiyê hatine rêzkirin.

Ji birepeyvên ji dû yan zêdetir jimarên mezin û yekî biçûk pêkhatî re **birên jimaran** tê gotin.

**Mînak:**

Heştê Adarê roja jinên cîhanê ye.

Bîst û yekê Adarê cejna gelê Kurd e.

## Taybetmendiyên Birên Jimaran

1-Birên jimaran yên hezarî tên nivîsîn dû, yê bi milyonan tê nivîsîn sê, yê bi mîlyaran tên nivîsîn çar endamên xwe hene.

Di her endamî de, di nav xwe de raveka hevalnavan, birên jimaran yan jî dibe jimarek bi tenê be.

**Mînak:**

Yê bi hezaran hatî nivîsîn.

Pênc hezar, dû sed û sê.
R. hevalnav R. hevalnavî jimar
Endamê 1 Endamê 2
Birê jimaran

-Yê mîlyonan hatî nivîsîn.

Sê mîlyon çar sed û pêncî hezar du sed û bîst û yek
R.hevalnav R.hevalnav R.Hevalnav R.H. B. gihanekan
Endama 1 E. 2 E.3
Birên jimaran

Yê bi mîlyaran tên nivîsîn.

Du mîlyar sê sed û bîst mîlyon, çar sed û şêst hezar pênc sed û pêncî û çar.
B.H. B.H B.H B.H B.H B.H B.gihanekan
E.1 E.2 E.3 E.4
Birên Jimaran

2-Birên jimaran di hevokê de, weke nav yan hevalnav tên bikaranîn.

Di mînakên derbasbûyî de hem nav, hem jî hevalnav hatiye bikaranîn.

3-Navên jimarî cuda tên nivîsîn.

Lê di çek, sened û karanînên di bankan de, bi hev ve tên nivisîn.

4-Di birên jimaran de; lêdan li ser navê jimara biçûk e.

## PIRS

1- Navên jimarî yên di mînakên li jêr de, diyar bikin.
-Şeş hezar, çar sed û sih û yek
-Du sed û yek hezar û not û neh
-Sê mîlyar û du sed û bîst û yek mîlyon û sê sed û sih û du hezar û sêsed û bîst û yek
2-Endamên birê jimarê yên li jêr ji hev cuda bikin.
Heftî û milyon, sê, sed û pêncî çar, du hezar çarsed û bîst û yek.

## 9- BIRPEYVÊN KURTKIRÎ

### XEBATÊN AMADEKARIYÊ

Çiqas xweş e welatê me, xweş be destê şervanan.
Kor be çavê neyaran, gel hiştîne kolanan.
Xwelî li serê Kurdê nezan, nizan biçin zozanan.

Dema hûn temaşeyî van rêzikan dikin, hûn dizanin peyva “bila, dixwazim, bila”, ketine.

Bi vî awayî li ser “Roj baş, çavron” nê jî bihizirin.

Niha jî nivîsîna jêr bi baldarî bixwînin.

Ciwanek hat li ser çavan “**tû hatî.”**
Bixêr hatî malî ava,“**te ava be”.**
Gelek ciwan û hêjaye,
Tîrek wî berda hinavan.

Di malika jor de, peyvên di nava neyenokê de hatine nivîsîn. Dema ev peyv tên bikaranîn yan dikevin,bandorê li ser wateya hevokê dikin?

## DAXUYANÎ

Di mijara jor de, peyvên “**tû hatî” “ te ava be”** bê ku bên bikaranîn wateya ku tê xwestin bê têgihandin, awayek tekûz tê têgihandin. Ji ber wê, ev peyv hatine xistin.

Dema em temaşeyî nivîsîna jor dikin, dibînin ku ti cudabûn di navbera peyvên "**li ser çavan tû bê**" û "**li ser çavan**" de nîne.

Yan jî dema yek xatir dixwaze, tu dibêjî: “Li ser çavan” yanî pêwîstî nîne, tû bibêjî: “Li ser çavan biçî.” Ji ber vê kar dikeve, peyvên ku ji hêla her kesî ve wateya wan tê têgihandin û dikevin, peyvên mayîn jî birepeyvekê bikartînin.

Bi kêmkirina peyvên hevokan yan jî bi qalib girtina birepeyvan tên holê, ji wan re **birepeyvên kurtkirî** tê gotin.

**Mînak:**

Hûn bi xêrhatin ji xebatê.

Ev hevoka jor asayî hatiye bikaranîn û kurtkirin li ser çênebûye. Ji bo kurtkirin tê de pêşbikeve, divê hin peyvên wê bên kêmkirin.

**Mînak:**

Ser çavan.

“Birên kurtkirî”

Hevoka li jor bûye birepeyvên kurtkirî. Ji ber ku hinek peyvên wê ketine.

## Taybetiyên Birepeyvên Kurtkirî

**1**-Birepeyvên kurtkirî, piranî bi ketina nav-kar, hevalnav-kar û hevalkar- karan pêk tên. Ev birepeyv ji dû navan pêktê.

**Mînak:**

**a**-Ez kîjan gulê bînim. A sor.

| | | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|---|
| Gul | a | sor | bîne. | = | A | sor |
| Nav | V. | H. | Kar | | Birepeyvên kurtkirî | |

**b**-Narîna ciwan bila were. Belê bila Narîna ciwan were. Belê Narîn

Birê kurtkirî

**c**-Yê di mal de rûniştî Egîd e? Bele yê di mal de rûniştî Egîd e. Belê Egîd e.

Birepeyvên Kurtkirî

**2**-Dibe ku endamek yê van bireyvan yek ji wan navan birepeyv be.

Mînak: Yê di mal de rûniştî Azadê zere? Belê Azadê zere.

**3**-Lêdana birepeyvên kurtkirî dikeve ser peyva dawî.

# BEŞA 2.

## B-ENDAMÊN HEVOKAN

## XEBATÊN AMADEKARIYÊ

Di waneya heya niha de, endamên zimanê me tînin holê hatine lêkolînkirin?

Bideng hat destpêkirin, kite, peyv, pêvek, kok, cûrê peyvan, erk û çêbûna wan hatin têgihandin. Peyva bi tena serê xwe kêr gelek tiştan nayê, rêzkirina van li gor destûrê zimanê Kurdî û pêwist hat dîtin bi awayekî watedar, girêdana wan ya bi hev re bêçêkirin.

Niha jî, di benda jêr de balê bikişînin ser peyva "wan" û bixwînin. Ev çawa bi hev re hatine girêdan. Bixebitin da hûn têbigihîn! Çawa ketine, di rewşa hevokê de.

**Mînak:**

1-Min demjimêrek dabû.
2-Zarokek di nav dibistanê de razabû.
3-Bizinek diçêrî.
4-Di nav bostan de rêça gurekî dixûya.
5-Birca Belek li Cizîrê ye.
6-Ji nişkan ve xaniyek şewitî.
7-Min cihek kevin yê lîstika Kurdan dît.

## DAXUYANÎ

Di hevokên jor de, hevoka destpêkê sê peyv in: "Min demjimêrek dabû." Ev her sê peyv bi rêzek diyar di nav rêxistinekê de hatine rex hev. Peyva ku kirina karekê dide diyarkirin, di dawiya hevokê de yên din jî li pêşiya kar hatine rêzkirin. Li milê din di destpêka hevokê de kirek, di nav hevokê de pêkir hatiye bikaranîn, bi vî awayî hatine sazkirin. Dîsa navê ku dibe pêkir, pêveka jimarekê dide diyarkirin, girtiye.

-Zarok**ek** di nav daristanê de razayîbû.
Nav Pêveka yek D. Nav p. daçek karê demê borî

Dema tu hevokên din lêkolîn bikî, tû dibînî ku her yek li gor rewşa bandora heyîna, li gor cih û awa hatine rêzkirin. Tû pêdihesî ku çiqas jimara peyva zêdetir dibe, wateya wê hevokê zêdetir dibe. Tû dibînî cudabûnek di navbera peyva “**ketim”** de û ya di peyvên “**Ji nişkan ve ketim**.” de heye.

Ev cudabûn zelalkirina wateyê ye. Hevoka pir peyv eger li gor destûran bê rêzkirin, hest, hizirîn, xwestek yan jî bûyeran hîn zelaltir tîne ziman.

Peyvên hest, hizir, daxwaz yan jî bûyerekê tînin holê re **hevok** tê gotin.

Di hevokê de kirek, pêkir, têrker, têrkera hevalkarî û kar yan destpêk û salox peyda dibin.

Endamên hevokên zimanê Kurdî bi dû awayan tên destgirtin.

**Endamên Hevokên Karî:** Kar, kirek, pêkir, têrker e.

**Endamên Hevokên Navdêrî:** Destpêk, Salox, têrker e.

# A-ENDAMÊN HEVOKA KARÎ

## I-KAR

### XEBATÊN AMADEKARIYÊ

Di dibistana seretayî de, hûn fêr bûbûn ku laşê mirovan ji sê parçeyan tê holê: Serî, gewde, dest û ling. Li gor we di nav van de ya girîng yan jî yên girîng kîjan in?

Mirovên bêdest û ling dikarin jiyan bikin lê bê serî û gewde, mirov jiyan nabin. Hûn dizanin hevok ji çar peyvan pêktên, di nav van de yên herî girîng kîjan in, niha jî benda jêr fêr bibin û bixwînin.

Bijîşka daxwazkirine ku Bager di hewa paqij, di nav cihên têr şînatî de bigere, ji ber vê ev e beriya mehekê ye, Heval Bager di nav cihên têr şînatî de, li ber hewaya paqîj digere. Niha ev şîreta bijîşk pêwîst dike, em tev bi awayekî çalak pêkbînin.

1- Peyvên binê wan hatine xêzkirin, ji nav hevokê derbêxin û bixwînin.

2- Peyvên di hevokê de, xêzik li binê wan hatîn danîn, ji nava hevokê derbêxin û carek din bêxin nav. Di navbera van her sê xwendinan de, di hêla wateyê de li gor xwendina yekem em têdigihin tengtir e, ji ber ku di hinek hevokan de rewşa kirina kar, cihê kar, demê wê hatine derxistin. Lê dîsa jî peyvên mayîn tiştekî didin têgihandin. Lê di xwendina seyem de çi tê kirin, çi dibe nayê diyarkirin. Ji ber peyva hevokê digire serxwe tine. Ji ber vê ew nabe hevok.

Nexwa peyva ku di hevokê de, hevok li ser tê avakirin, barê hevokê radike kar e. Di hevokê de girîngiya vê endamê ji mirovan re pire.

**Mînak:**

Di dawiya hevokê di, di parça me de, peyva “bigere”, “digere” û “pêkbîne”, karin. Peyvên ku hevokê kifş dikin û hevokê tekûz dikin bi vî awayî dibin kar.

Di nav hevokê de, peyva kirina kar û bûyerekê dide diyarkirin re **kar** tê gotin.

Di hevokê de, pêveka karê serbixwe weke karan girîng in û ew jî rewşa heyînan didin diyarkirin û hevokê tekûz dikin.

**Mînak:**

Baran li ser welatê me dibare.

Di vê hevokê de peyva ku kirina karekê dide diyarkirin, kar e. “Li her çar aliyên cîhanê hevalên me hene."

## a-Taybetmendiyên Karê

**1**-Her karek tê wateya hevokekê.

**Mînak:**

Sê roj berê hatim.

→ Ma çûme?

→ Na derbas dibe.

Ji ber ku di her rêzikek ji van de karek heye, her rêzikek hevokek e.

**2**-Carnan di nivîsînên goftûgoyan de kar dikeve.

**Mînak:**

→ Kurê min bi ku ve diçî?

→ Hewlêrê

→ Ez jî.

## b-Cihê Karê

Di zimanê Kurdî de, kar carnan dikeve nav hevokê, carna li dawiya hevokê tê.

**Mînak:**

Ez **çûm** dibîstanê.
Egîd pirtûk **xwend**.
Di hevoka destpêkê de, kar ketiye nîvê hevokê.
Di hevoka duwem de jî kar ketiye dawiya hevokê.
Di helbestê de dibe ku kar weke peyva destpêka hevokê jî were.

**Mînak:**

Hat hevalek delal û çak,
Min got keremke jorê.
Nexist pêlav ji lingê xwe,
Gundî dibezin dorê.
Maç dike pîr û kala.
Zarok jî ketine dorê.

## c-Peydabûna Karê

Kar, li gel kirekê  pirskirin û çûna, çi kir, çi dikir, çi dike, çiye, kî ye û hwd....tên pirskirin.
Di mînakên jêr de hûn kara peyda bikin.
Ew çi dikin? Bersiv dirazin.
Em çi bikin? Bersiv biçin.
Wî çi kir? Bersiv berdewam kir.

## d-Beşên Karan

***Kar li gor wateya xwe dibi sê beş*:**

1- Karên Hevpar
2- Karên Zêdeker
3- Karên Kifşker

### 1- Karên Hevpar

**Mînak:**

| Histirên evîndaran | Baranê biharan | dibarin. |
| --- | --- | --- |
| Kireka 1 | Kireka 2 | Kara Hevpar |

Dema em temaşeyî rêzika yekê dikin, dibînin ku kara hevokê peyva "dibarin"e û kara kireka duwem jî heman peyv e.

Ew karên ku ji yekê zêdetir kirekan pêşwazî dikin re **kara hevpar** tê gotin.

### 2-Karên Zêdeker

Gelê Kurd berxwedan kir, berxwedan kir.
Kara bingehîn Kara Zêdeker

Pakrewan ticaran namirin, ticaran namirin.

Carnan ji bo xweşikirina wateyê dibe ku alav bikeve navbera van herdû karên dubar e.

Ew karên bingehîn ya ku encama hevokê dide diyarkirin, ger li pey wê ji bo bal kişandinê dubare bibe, ji ya dubarebûyî re **karên zêdeker** tê gotin.

**Mînak:**

Şervanên gelê Kurd, li Rojavayê Kurdistanê têkoşînkirin,
Kara bingehîn
têkoşînkirin.
Karê zêdeker

## 3- Karên Kifşker

Dema di hevokê de, dû kar hebin, kara duwem diyarkirina kar yekem dide diyarkirin, jê re **karên kişfker** tê gotin.

**Mînak;**

-Neyarê gelê Kurd, rewşenbîrên Kurd kuştin, lêdan daleqandin.
Kar 1 kara kifşker

-Rêberê gelê Kurd, Kurd zanakirin, pêşxistin.
Kar 1 kara Kifşker

Dema tû li mînaka destpêkê dinêrî kara bingehîn peyva **“kuştin**”e û peyva **“lêdan û daleqandin**” ji ber ku kifşkerê kara bingehîn e, kara kifşker e.

## Kar li gor çêbûna xwe dibe sê beş:

### a-Kara Xwerû:

Ew karên ku tenê ji peyvekê pêk hatî û pêvekên sazker nestandîn re **kara xwerû** tê gotin.

**Mînak:**

Ew ji mal **hat**.

Wê nivîsîn **nivîsî**.

## b-Kara Darişţî:

Ew karên xwerû yên ku pêvekên sazker standî û darezandinek nû dayîn avakirin re **kara darişţî** tê gotin.

**Mînak:**

Ew di bexçe de **raketibû**.

Çîmenê karê xwe yê malê **çêkiribû**.

## c-Kara Hevgirtî:

Ew karên ku ji nav û karekê yan jî ji du karan pêkhatî re **kara hevgirtî** tê gotin.

**Mînak:**

Hosta Hine Birca Belek **avakir**.

Me baxçêyê xwe **avda**.

Neyaran **xirakirin**.

Mala me **tarûmarkirin.**

Derdê me pir **zêdekirin**.

Roja me, wan **perdekirin**.

**NIRXANDIN**

Dema em temaşeyî mînakên jor dikin, dibînin ku peyvên tarî hatine nivîsîn, ji nav û karekê hatine çêkirin.

**Mînak:**

Xirabkir, tarûmarkir, zêdekirin, perdekirin

## Cûrên karên hevgirtî

### a-Kara Hevgirtî Yê Ji Nav û Kar Çêdibin:

Me li Rojava saziyên perwerda Kurdî di dibistanan de sazûmankir.
Mînakên weke vê hûn dikarin lêkolîn bikin?

### b-Karên Hevgirtî Yên Ji Du Karan Pêktê:

Ev cûrê karan ji du karên hevgirtî pêktê.

**Mînak:**

Heval xemê nexwe **borîderbasbû.**

## PIRS

1-Taybetmendiyên karê bêjin.
2-Kar li gor wateya xwe dibe çend beş?
3-Kar li gor çêbûna xwe dibe çend beş?
4- Kara hevpar bimînakan vekin.
5-Li ser kara kifşker dû mînakan sazbikin.

## II-KIREK

# XEBATÊN AMADEKARIYÊ

Di vê cîhanê de, tiştek ji ber xwe ve çênabe. Gêrbûna kevirekê ji ber xwe ve çênabe. Di çêbûna her tiştî de bandorek yan bandorên em nabînin û tênagihin hene. Çawa ba sedemê hejandina heyînek nerm e. Her çêbûnekê sedemek xwe heye. Di rêziman de jî heyîna kirina kar, xebat û tevgerekê pêktîne heye.

Tevger û yê tevgerê dike, du endamê bêyî hev nayên cudakirin û peyvên binê wan hatine xêzkirin lêkolîn bikin.

Hatim min dît, gula sor e.

Werandibûn pelê dar e.

Xirakirin ciwaniya te.

Hirç û hov marê kor e.

Di mijara we xwendî de, çend karên binê wan hatî xêzkirin hene. Kara yekem peyva “**hatim**”e. Lê di vê hevokê de, peyvek yan birepeyvên ev kar pêkanîn nayên dîtin.

Lê dema em temaşeyî vê karê dikin, dibînin ku tîpa **“m”** ya ku kesê daxive dide diyarkirin, bi dawiya karê ve ye, ji ber wê em dizanin kesê hatî nivîskar bixwe ye.

Dîsa demê em temaşeyî kara “**werandin**” dikin, dibînin ku bi dawiya wê ve pêveka kesê sêyemîn yê kom dide diyarkirin, hatiye zeliqandin. Ji ber wê têdigihin ku kesê karkirî kesê ne amade ye. Di zimanê Kurdî de, gelek caran kar tê lê kirek nayê. Hebûna kirekê bi pêvekên li dawiya kara ve dibe tê diyarkirin.

### a-Taybetmendiyên Kirekê

**1**- Dibe ku di hevokê de ji yekê zêdetir kirek hebe, ev kirek, bi hev re yan cuda  cuda heman karî bikin yan jî kirina karekî bigirin ser xwe.

**Mînak:**

Gula mina şox û şeng û şepal e.
Sibehê nîvro dike gazî dikale.
Keç xort û ciwan hatin bi hev re.
Me azad kin ji neyarê xedar e.

Dema em temaşeyî rêzika sêyemîn dikin, dibînin ku sê kirek bi hev re hatine karanîn. Dema em vê hevokê dixwînin, têdigihin ku **keç xort û ciwan** jî hatine .

**2**-Kirek neneçar e di hevokê de, her tim bi awayê peyv û birepeyv bê, dibe ku carnan bi pêvekê li dawiya karan hatî danîn  kifş bibin.

**Mînak:**

Hatin şewitandin cih û warê me.
Vexwarin xwîna gelê me.

Di van herdû hevokan de jî bi pêveka ya karê ve hatî zeliqandin, em têdigihin ku kirek peyva “**wan” e.**

**3**-Dema peyva pêwîst di hevokê de bê bikaranînîn carnan dibe ku kirek neyê diyarkirin.

**Mînak:**

Pêwîst e nan neyê xwarin.
Pêwîst e neyar ji Kurdîstanê bên derxistin.

### b-Cihê Kirekê:

Bi awayê giştî kirek di destpêka hevokê de cih digire.

**Mînak:**

**Ew** çû Amedê.
Di vê hevokê de, em dibînin ku peyva kirek “**ew”e.**

Lê belê ji ber peyva tê rêxistinkirin, pêwîst e nêzîkî karê bibe, carnan endamê hevokê cih diguharin.

**Mînak:**

Li çiyê lawir kombûne.
Li bajarê me kesekê daxuyaniyek da.

| | | |
|---|---|---|
| Min | dît | gula sor |
| Kirek | Kar | Pêkir |

| | | | | |
|---|---|---|---|---|
| Mamoste, | xwendekar , | rêveber | çûn | geştê. |
| Kirek1. | Kirek2. | Kirek3. | kar | Têrkerê Cihî |

| | | | |
|---|---|---|---|
| Dû heval | bi hev re | çûn | zozana |
| Kirek | T. hevalkar | kar | Têrkera yekser |

| | | |
|---|---|---|
| Egîd | ji zozanan | hat |
| Kirek | T.Cihî ya ne yekser | Kar |

## c-Beşên Kirekan:

**Kirek li gor wateya xwe dibin heft (7) beş:**

### 1- Kireka Rast:

Ew kirekên ku rasterast kirina kar rêvedibe û ji ti peyvan bandor nabin re **kireka rast** tê gotin.

**Mînak:**

Ew çû dibistanê.
Hatim dibistanê.

Di vê hevoka dawî de pêveka “**im**” li şûna peyva “**ez”** de hatiye bikaranîn û kirekê rast yê vê hevokê peyva “ez”e.

### 2- Kireka Qaşo:

Weke em dizanin di hevokê nederbaz de kireka rast tine ye. Ji ber dema em dibejin Egîd miriye, diyar nabe yê Egîd mirandî kî ye? Ji

ber wê em neçarbûne peyva Egîd ya ku dihat xwestin têrker be, weke kirek bikarbînin. Ji vî cûrê kirekan re **kireka qaşo** tê gotin.

**Mînak:**

Ew miriye.
Kireka Qaşo

Ew ket.
Kireka qaşo

## 3-Kireka Vekirî:

Ev cûrê kirekê ji çend peyvan yan jî birepeyvan pêktê. Dema kireka rast, hevokê rêvedibe û hin peyv wê kireka rast vekin, ji wê vekirinê re **kireka vekirî** tê gotin.

**Mînak:**

Rêberê gelê Kurd, Rêber APO li dibistanênTirkiye xwend.
Kireka rast Kireka Vekirî

## 4-Kireka Veşartî:

Ji hevokên ku kireka wan nediyar lê bi alîkariya pêvekên bi dawiya karan ve dibin re **kireka veşartî** tê gotin.

**Mînak:**

Pirtûk xwendin.

Ji bilî zanînê tiştekê nabînim.

## 5-Kireka Hevpar:

Ji wan kirekên çend karên wan heyî yan çend karan digirin serxwe jê re **kireka hevpar** tê gotin.

**Mînak:**

Hemû xwedekaran, pênûsên xwe amadekirin, nivîsîna xwe nivîsîn.
Kireka Hevpar

## 6-Kireka Kifşker:

Kirekên li pey kireka rast tên û kireka rast kifş dikin ji wê kirekê re **kireka kifşker** tê gotin.

**Mînak:**

<u>Her tişt</u> <u>av, dîrok, stêrk, mirov û hizirîn</u> diherike.
Kireka rast Kireka Kifşker

Di vê hevokê de, kireka rast "**her tişt**"e lê peyvên "**av, dîrok, stêrk, mirov û hizirîn"** tişta di nav "**her tiştî**" de didin kifşkirin kireka kifşker e.

## 7-Kireka Zêdeker:

Peyva "jî" dema li pey kirekê têne dubarekirin û wateya wan xurt dikin ji wan re **kireka zêdeker** tê gotin.

**Mînak:**

<u>Ez jî</u> hatim.
Kireka Zêdeker

## CÛR Û BIREPEYVÊN DIBIN KIREK

Hemû cûr û birepeyvên dibin kirek dibe ku ev kirek, bibin Kireka Rast, Kireka Vekirî, Kireka Kifşker û Kireka Zêdeker.

- *Nav*: <u>Egîd</u> çû şer.
- *Cînav*: <u>Ew</u> çû dibistanê.
- ***Palvedariya Navan****:* <u>Xeyriyê Dihokî</u> çû mal.
- ***Raveka Hevalnavan****:* <u>Gulên zer</u> ji bê avî diwerin.
- Bire Nav û Kar

Ev jî dibe Destpêk

**Mînak:**

Ji bo aştî û azadiyê <u>xebatkirin û meşandin</u>, karek birûmet e.

- Birepeyvên hevalnav û karan

Ev jî destpêk e: <u>Reşkirin</u> nebaş e.
<u>Deng û awazên şalûl û bilbilan</u> xweş in.
Destpêk
Birên nasnavan: <u>Mam Cangîr</u> çû nêçîrê.

## LIHEVHATINA KAR Û KIREKÊ

Pêwîst e di navbera kirek û karê yan pêkir û karê de hevsengî hebe. Tinebûna hevsengiyê di navbera wan de, dibe sedema xirabûna wateyê. Hevsengiya di navbera kirek û karê yan pêkir û karê de bi dû cûran çêdibe.

- Hevsengiya yekjimar/pirjimar
- Hevsengiya kesî

**1- Pêwîste Hevsengî di yekjimar û pirjimarbûnê de, di navbera kesê dibe kirek û karê yan pêkir û karê de hebe.**

| Kirek | Kar | Pêvekên kirekê |
|---|---|---|
| **Ez** | hat | **im** |
| **Tu** | hat | **î** |
| **Ew** | hat | **-** |
| **Em** | hat | **in** |
| **Hûn** | hat | **in** |
| **Ew** | **hat** | **in** |

**Mînak:**

Ez di demê spêdê de ji bakur hatim.
Tu zû ji mal hatî.
Ew ji Hewlêrê hat.
Em ji dibistanê hatin.
Hûn ji holanê hatin.
Ew ji çiyê hatin.

**Hevsengiya pêkir û karê**

| | |
|---|---|
| Min ew xwend. | Min ew xwendin. |
| Te ew xwend. | Te ew xwendin. |
| Wî ew xwend. | Wê ew xwendin. |
| Me ew xwend. | me ew xwendin |
| We ew xwend. | We ew xwendin. |
| Wan ew xwend. | Wan ew xwendin. |

2-**Hevsengiya Kesî**

Ger hevsengî di navbera kirek û karê de çêbibe, pêwîste herdû yekjimarbin, yan herdû pirjimarbin.

a- Y. Y. Ez û tu hatin.
b- Y. P. Ez û hûn hatin.
c- P. P. Em û hûn hatin.
d- P. Y. Em û tu hatin.

Di rewşek bi vî awayî de, di karê de ti guhartin çênabin.

**PIRS**

***Kirekên di hevok û benda jêr de derbazbûyî peyda bikin.***

Rojek ya biharê ... çûn dibistanê, ji wir…. xwarin û ava xwe girtin û bi hev re ketin ser riya geştê; dema çûn di rê de…. gul diçînin.

Ji bo parastina wan ........... şiyarî dikirin û wê demê ..................... li ser girekî rûniştibûn.

**1-** Cûrê van kirekên we peydakirî bidin diyarkirin?
**2-** Çêbûna heman kireka bidin diyarkirin?
**3-** Kirekên di hevokên jêr de heyîn? Lêkolîn bikin. Cûr û çêbûna wan bidin diyarkirin.

a- Baran li ser çiyayên Kurdistanê hûr hûr dibare.
b- Xaniyê hatî bilindkirin ji binî ve hilweşiya.

c- Herikandina vê avê ji aliyê Hogir û Baran ve tê pêkanîn.

**4-** Karên di hevokên jêr de li gor kirekên wan bikarbînin.

a- Ez û ew ji daristanê hat···

b- Hûn bi hev re hat···

c- Ez ji goristanê hat···

## III- PÊKIR

### XEBATÊN AMADEKARÎ

Axaftvanek dema dixwaze baxive, dixwaze di destpêkê de komek mezin temaşevan hebin. Piştre dixwaze ji bo wî/ê û axaftina wî/ê çepik werin lêdan. Ev girêdayî bandorkirina axaftvan e, lê belê di nav temaşevanan de kesê bandor nebin jî wê hebin.

Çawa di hevokê de dikirin û kesên bandor dikin, hebin û di heman demê de yên bandor dibin jî hene?

Dema hûn benda jêr bixwînin li ser kar û kirekan baldar bin û temaşe bikin, gelo heyînên ji kirina karê kirekê bandorbûyîn hene? Ev heyîn çi ye? Peyvek e, birepeyvek e, xwerû ye, darişti ye yan hevgirtî ye?

Gulistan nameyê pir xweş dixwîne lê dema li derdora xwe temaşe dike, dilê wê şadibe, ji ber li rex wê hevalek ya wê jî bi wê re dixwîne.

Piştî xwendinê, Gulistan, televizyonê vedike û temaşeyî nûçeyan dike. Bi vî awayî roja xwe diborîne.

## DAXUYANÎ

We benda jor xwend. Heyînên ji kirina karê kirekê bandorbûyîn we dîtin? “*Gulistan nameyê pir xweş dixwîne.*” Di vê hevokê de kirek “*Gulistan*”e û kar jî “*dixwîne.*”

Di vê hevkê de peyva bi karê xwendinê bandorbûyî kîjan e?

Pêkirek xwendin li ser hatî kirin heye?

Di hevoka din de “*Dema li derdora xwe temaşekir.*” kireka vê hevokê veşartiye û “*wê*” “*temaşekir*” kar e.

Di vê hevokê de “wê” li çi temaşekiriye?

Di hevokê de peyv yan birepeyvên heyînên bi kirina karê kirekê bandor dibin re **pêkir** tê gotin.

### a- Taybetmendiyên Pêkiran

1- Pêkir, di hevokên derbas de tên dîtin.

**Mînak:**

“Egîd daristan parast.”

Ji ber ku parast heyînekê dixwaze karek derbas e. Peyva “*daristan*” jî bi kirina karê kirekê bandorbûye, pêkir e.

2- Carna hevok li ser pêkirê tê avakirin.

**Mînak:**

Pirtûk hat nivîsîn.

Nan hat xwarin.

3- Hevokên saloxî bi giştî ji ber rewşekê didin diyarkirin pêkir di nav wan de nîne.

4- Carna hevoka mercî dibe pêkir.

**Mînak:**

Ger werî were.

Karê vê hevokê “*were*” ye.

Kirek peyva, “tû” ye.

Pêkira wê jî “ger werî.”

5- Hevoka ku ji yekî din hatî girtin û di nava gotinên nivîskar de hatî bikaranîn pêkir e.

**Mînak:**

Mamoste got: "Bila her kes bê dibistanê."
kirek kar pêkir

6-Di hevokekê de, pêkirek tê bikaranîn.

**Mînak:**

Mamoste waneyên rêzdariyê nîşanî xwendekaran dike.
pêkir

**7**- Pêkir, çawa dibe ku peyvek be, ew qas jî dibe ku birepeyv jî be.

**Mînak:**

Min gula sor a zozanan dît.
pêkir

## b- Cihê pêkirê

Di hevokên cûrbecûr de ji ber tê xwestin pêkir nêzîkî karê be, her tim li pêşiya karê tê bikaranîn.

**Mînak:**

Xwendekar pirtûkê dixwînin.
Pêkir

## c- Peydakirina Pêkiran

Em fêr bûbûn ku peyva bikirina karê kirekê bandor dibe pêkir e.

Bi vî awayî dema em pirsa çi, ji karê dikin, peyv yan birepeyvên dibin bersiva vê pirsê dibe pêkir.

**Mînak:**

Nesrînê nivîsî.
Nesrînê çi nivîsî?
"Pirtûk"

## d-Cûrên Pêkiran

## 1-Pêkir li gor sazûmanî û karanîna xwe dibin dû beş:

### ➢ Pêkirên diyar

Pêkirên diyar ew peyv yan birepeyvên dibin pêkir ger pêveka nediyarbûnê nestandî be û yekser kirina kar pêşwazî kiribe jê re **pêkira diyar** tê gotin.

**Mînak:**

Min gula zer çinî.
Pêkira diyar

### ➢ Pêkirên nediyar

Ger ew peyvên dibin pêkirên pêveka nediyarbûnê “ek” bistîne û kirina kar bi awayekî nediyar pêşwazî bike, jê re **pêkirên nediyar** tên gotin.

**Mînak:**

Wan nameyek xwend.
Pêkira nediyar

## 2- Pêkir li gor wateya xwe dibe sê beş:

### a-Pêkirên Hevpar:

Di hevokên zincîrî yên bi hev ve girêdayî dubarekirina heman pêkirî nexweş e, ji ber wê çendê pêkirên li pey pêkira destpêkê tên dikevin. Ev pêkir bi tenê dibe pêkira tevayî karên wan hevokan yanî pêkira hevpar ji yekê zêdetir karan pêşwazî dike, jê re **pêkira hevpar** tê gotin.

**Mînak:**

Gulîzarê gul anî, çand û avda.
Pêkira hevpar

Di vê mînakê de sê kar hene, ev tê wateya sê hevokan lê pêkirê hemûyan jî peyva **“gul**”e.

### b-Pêkirên Kifşker:

Dilbixwîn, herdû zaravan, Kurmancî û Zazakî dizane.
Pêkira bingehîn Pêkira kifşker

Dema em temaşeyî vê mînakê dikin, dibînin ku pêkira bingehîn peyva “**herdû zarava**”ye.

Peyvên “**Kurmancî û Zazakî**” pêkira kifşker e.

Dema di hevokekê de pêkira bingehîn tê bikaranîn û li pey wê hin peyv yan jî birepeyvên wê pêkira bingehîn bide kifşkirin, ji wan peyv yan jî birepeyvên kifşkirina pêkira bingehîn çêkirî re **pêkira kifşker** tê gotin.

**Mînak:**

Ez ji van daran, hêjîr, hinar û sêvê hezdikim.
Pêkira bingehîn Pêkira Kifşker

**c-Pêkirên Zêdeker**

Dema li ser pêkira bingehîn peyva “jî” bên zêdekirin jê re **pêkirên zêdeker** tên gotin.

**Mînak:**

Em di Gola Wanê de pêşbirka melevaniyê jî dikin.
Pêkira Zêdeker

Li ser pêkira vê hevokê, li gel wateya birepeyvan, alava “jî” hatiye zêdekirin.

**Mînak:**

Hûn, ma pirtûkê jî çêdikin?
Pêkira Zêdeker

Pêveka “ma, jî” li ser wateya pêkira “pirtûk” ve hatiye zêdekirin.

## *3-Pêkir li gor çêbûna xwe dibin sê beş:*

**a-Pêkirên Xwerû:**

Ew pêkirên ku ji peyvekê tenê pêkhatî û pêvekek sazker nestandî û kirina kar li ser hatî rêvebirin re **pêkirên xwerû** tê gotin.

**Mînak:**

Zozanê jêbir kirî.

**b-Pêkirên tûredayî (Dariştî):**

Dema pêkirên xwerû, pêvekek sazker distînin û wateyek nû li ser tê avakirin re **pêkirên dariştî** tê gotin.

**Mînak:**

Wan <u>guldank</u> anî.

### c-Pêkirên Hevgirtî:

Ew pêkirên ku ji dû peyvan pêkhatî re **pêkirên hevgirtî** tê gotin.

**Mînak:**

Wan <u>marmasî</u> girtin.

## e-Peyv û Birepeyvên Dibin Pêkir

Hemû peyvên di rewşa nav de dikarin bibin pêkir:

**Mînak:**

**Nav**: Nermînê di baxçe de <u>gul</u> çinîn.
**Cînav**: Axînê <u>ew</u> anî.
**Raveka hevalnavan**: Sîpan <u>tovikên şûrkirî</u> rijandin.
**Palvedariya navan**: Wê <u>lênûsa ziman</u> anî.

Di mînaka yekem de peyva **"gul"** ji ber ku heyînekê didin naskirin nav e; karê kirekê li ser hatiye meşandin, bûye pêkir.

Di mînaka duyem de peyva "**ew**" cînav e lê ji ber ku karê kirekê li ser hatiye meşandin, bûye pêkir.

## PIRS

1-Pêkir li gor çêbûna xwe dibin çend beş?
2-Pêkir li gor wateya xwe dibin çend beş?
4- Ji bo her pêkira hevpar, kifşker û zêdeker dû mînakan saz bikin.

# 4- TÊRKER

Ji peyv û birepeyvên wateya hevokê didin têrkirin cih, dem, çawaniya kirina karê hevokê diyar dikin re **têrker** tê gotin.

## *1-Têrker li gor cih û karanîna xwe dibe sê beş:*

### a-Têrkerên Hevalkarî

Ew têrkerên ku koka wan hevalkar in û di aliyê dem, cih û ber, rewş, çendinî û pirsyarî de kar yan jî saloxê bandor dike re **têrkerên hevalkarî** tê gotin.

**Mînak:**

Wan şahiyek par lidarxist.

Têrkera hevalkar

Temaşeyî vê benda jêr bikin û di vê bendê de kar çawa hatiye kirin, çima hatiye kirin, kengê hatiye kirin û li kûderê hatiye kirin fêr bibin.

Me li jor ev gotin bihîst.

Me di demê sipêdê de pirtûk xwend; piştre me bilezûbez şirove kir.

*DAXUYANÎ*

Ji bo em peyvên wateya kar temamdikin bibînin, em ji hevoka destpêkê destpêbikin.

Di hevoka destpêkê de peyva “li jor” di hêla cih û ber de cihê karê diyar dike.

Di hevoka duwem de peyva “demê sipêdê” di hêla dem de wateya karê dane temamkirin.

Tevayî peyv û birepeyvên di benda jor de binê wan hatine xêzkirin wateya karê di hêla ber, dem, rewş û qasî de temamkirine.

Peyv û birepeyvên wateya karê di hêla dem, rewş, cih û ber, qasî û pirsyarî de temam dike yan awayê karê dipirse têrkera hevalkarî ne.

### a- Taybetmendiyên Têrkerên Hevalkarî

- Hevalkar, di nav hevokê de wateya karê dide temamkirin.

**Mînak:**

Rêzdar pirtûk êvarekî anî.

Dara li daristanê dar gelek şkandin.

Nûgihan berjêr çû.

Di van mînakan de peyvên binê wan hatine xêzkirin ji ber ku wateya karê dide temamkirin têrkerên hevalkarî ne.

- Di hevokekê de cuda yan ji heman beşî ji yekî zêdetir têrkerên hevalkarî dibe bên bikaranîn.

**Mînak:**

Hozan pirtûk sipêdê zû xwend.

Egîd danê êvarî demjimêr çarê hat.

### b- Cihê Têrkera Hevalkarî

Her çiqas têrkera hevalkarî wateya kirina karê temam dike jî her demî li rex karê nayê bikaranîn.

Hûn dikarin vê rastiyê di mînakan de lêkolîn bikin.

### c- Peydakirina Têrkera Hevalkarî

Ji ber ku têrkera hevalkarî di nav xwe de tê dabeşkirin, ji ber wê pirsên ku em têrkerên hevalkarî bi wan dibînin jî dibin çend beş.

- Kengê? Demî
- Çawa? Rewşî
- Li kû, ji kû ve, li kûderê? Cih û ber
- Çiqas? Qasî

→Pirs: Evîn, kengê çû mal?

→Bersiv: Evîn, êvarî çû mal.

→Pirs: Hêvî, çawa hat?

→Bersiv: Hêvî, bilez hat.

### ç - Beşê Têrkerên Hevalkarî

Têrkerên hevalkar li gor karanîna xwe ya li gor karan dibe pênc beş:

## 1- Têrkerên Hevalkarî Yên Demî

Ew têrkerên hevalkarî ku demê kirina kar û saloxê didin diyarkirin re **têrkerên hevalkarî yên demî** tê gotin.

**Mînak:**

We **îro** pirtûk xwendibû.
T.H.Demî

Têrkera hevalkarî ya demî, dema kirina karê didin diyarkirin.

Sînem demjimêr heftê nûçeya diweşîne.

Zivistanê dar pelên xwe diwerînin.

Arjîn gava din li gel Şîlanê pirtûk xwend.

Di van mînakan de peyv û birepeyvên binê wan hatine xêzkirin têrkerên hevalkarî yên demî ne.

## 2-Têrkerên Hevalkarî Yên Rewşî

Ew têrkerên hevalkarî ku rewşa kirina kar û saloxê didin diyarkirin re **têrkerên hevalkarî yên rewşî** tê gotin.

**Mînak:**

Rêjînê gul **ciwan** çand.

T.H. Rewşî

Têrkerên hevalkarî yê rewşî, rewş û awayê karê dide diyarkirin.

→ Leheng îro hin hevok, **xweş** gotin.

→Ferman di pêkilkan re **bilez** çû.

Di van mînakên jor de peyvên ku bi reş hatîn nivîsîn têrkerên hevalkarî yên rewşî ne.

## 3-Terkerên Hevalkarî Yên Cih û Ber

Ew têrkerên hevalkarî yên ku cih û berê kirina kar û saloxê didin diyarkirin re **têrkerên hevalkarî yên cih û ber** tê gotin.

**Mînak:**

Xatûn **<u>berjor</u>** çû.

T.H. Cih û ber

Têrkerên hevalkarî yê cih û ber, cih û berê kirina karê dide diyarkirin.

**Mînak:**

Dilşad hat û **berpêş** çû.

Diljîn **berjêr** çû.

Di mînakên jor de peyvên bi reş hatine nivîsîn yên weke **"berpêş, berjêr "** têrkerên hevalkarî yên cih û ber in.

## 4-Têrkerên Hevalkarî Yên Çendî

Ew têrkerên hevalkarî ku qasiya kirina kar û saloxê didin diyarkirin re **têrkerên hevalkarî yên çendî** tê gotin.

**Mînak:**

Wan nivîsîn **<u>gelek</u>** xwendin.

T.H. Çendî

Têrkerên hevalkarî yê çendî, qasiya kar dide diyarkirin.

**Mînak:**

"Bayê jêrî hat zivirî,
Dar û devî rabûn ji binî,
Sosin **hindek** hat û girî,
Ji ber wê **ewqas** dilbikulî."

→ Kovan pirtûk **zêde** xwend.
→ Xwendekarên me **pir zêde** dinivîsin.

Di hevokên jor de peyvên "**hindek, zêde, pir zêde**" yên reş hatine nivîsîn têrkerên hevalkarî yên çendî ne.

## 5- Têrkerên Hevalkarî Yên Pirsyarî

Ew têrkerên hevalkarî yên ku pirsyarê ji kirina kar û saloxê dikin re **têrkerên hevalkarî yên pirsyarî** tê gotin.

**Mînak:**

We pirtûk **<u>kengê</u>** xwend?
T.H.Pirsyarî

→ Te xwendekar **çawa** rêkirin malê?
→ We Egîd **bi kû ve** rêkir?

Di hevokên jor de peyvên weke "**kengê, çawa, bi kû ve**" têrkerên hevalkari yên pirsyarî ne.

**PIRS**

**1-** Têrkerên hevalkarî yên di benda jêr de bidin diyarkirin?

*"Dema sipêdê zû ji xew rabûm; ez û hevalek yê xwe bi tirambêlê çûn geştê. Dema em dimeşiyan, em rastî gelek çandên cuda û pir delal dihatin, bi dîtina wan çandan re em gelek şadbûn."*

**2-** Têrkerên hevalkarî yên we dîtîn, cûrên wan bidin diyarkirin.

**3**-Li ser têrkerên hevalkarî yên demî û rewşê dû mînakan saz bikin.

## B- TÊRKERÊN CÎHÎ YÊ YEKSER

### XEBATÊN AMADEKARIYÊ

Dema peyvek ne hevalkarî bêyî kû daçekan bigire cihê kirina kar diyar bike,çi nav lê tê kirin?

Dema li vê mijarê temaşe dikin, peyvên bi vî awayî dibînin?

Rojekê xwendekar bi armanca bejdarbûna Newroza Qendîl,diçin Qendîlê. Ji bo xwe ji tavê biparêzin xêbetên havînî bi xwe re dibin.lê berevajî tişta goman dikirin, baranek pir dijwar dibare. Xwendekar dikevin bin xêbetê, herî û av tavêje binê xêbetê. Piştî şahiyek xweş, xwendekar dizivirin mal.

### PARÇEYEK JI SERPÊHATIYA ROJEK YA BIHARÊ

Rojek ya biharê bû, çend heval ji aliyê çiya ve hatibûn mala me. Berî heval bên, agahî hatibû ku, leşkerên dagirker wê bên gund. Ev agahiya ji me re hatî, me ji hevalan re digot. Lê hevalan: " Li gundê em jê hatîn jî, ev nûçeya direw hebû." Bi vî awayî em razan. Di xewnê de, min dît leşker hatibûn gund û şerekî bêhempa dihat kirin. Di nava vê xurûşê de ez ji xew rabûm û bi lez min xewna xwe ji

bavê xwe re got. Piştî guhdarkirinê bavê min jî bi awayekî bi tirs heval ji xew rakirin û got: “Neyaran dora gund girtine, kemînên xwe danîneli ser kaniyê, hinek çûne besta jor û hinek derbasî vî girî bûne.”...

## DAXUYANÎ

Dema em temaşeyî mijara li jor dikin, dibînin kû peyvên binê wan hatî xîzikdan bêyî bi karanîna daçekan, cihê kirina kar dane diyarkirin.

Ji peyvên ne hevalkarî, daçek ne girtîn û yekser cihê kirina kar didin diyarkirin re  têrkerê cihî yê yekser tê gotin.

Mînak:

Ew çû deştê.

Neyar hatin Efrînê.

Li van mînakan temaşe bikin, peyva di hevoka yekem de,peyva “deştê” û di hevoka duwem de jî peyva”Efrînê” ne hevalkarin, her wiha bi hatina daçekê bandor ne bûne û cihê kirina kar bi awayekî yekser dane diyarkirin. Ji ber wê em ji wan re dibêjin, têrkerê cihî yê yekser.

## CIHÊ TÊRKERÊ CÎHÎ YÊ YEKSER

Têrkerê cîhî yê yekser, bi awayekî giştî dikevin dawiya hevokê.

## PIRS

P1- Hûn jî mijarekî binivîsin û têrkerê cihî yê yekser yên di wê mijarê de bidin diyar kirin.

P2- Li  gorî we çi ciyewazî di navbera têrkera hevalkari ya cih û ber û têrkera cihî ya yekser de heye?

## c- TÊRKERÊN CÎHÎ YÊN NE YEKSER

**XEBATÊNAMADEKARIYÊ**

Dema karek ji aliyê kesekê ve tê kirin, cihê kirina wî karî jî heye. Ew peyva cih dide diyarkirin ji bo zelalkirina wateya hevokê tê bikaranîn. Dema kesek daxive yan dinivîsîne dikare cihê kirina kar nebêje. Gelo dema em cihê kirina kar bêjin yan nebêjin bandorê wateya hevokê dike?
Benda jêr bixwînin û cihê kirina kar bidin diyarkirin. Temaşe bikin ka ev bi kîjan daçekî re hatine bikaranîn. Piştre jî peyv yan birepeyvên cih didin diyarkirin ji nivîsînê derbêxin û dubare bixwînin. Binêrin ka kîjan xwestir û zelaltir e?

### PARÇEYEK JI GERYANAMÊ

"Em ji mal birêketin piştî zor û zehmetiyek zêde, gihan herêma Çemcu, min temaşe kir heval di bin kolê de rûniştibûn. Hevalek jî li ser gir bi bêtêlê daxivî; piştî dawî anîna axaftinê bi hinek hevalan re derketin rê. Di kaşî re hewaketin û gihan cihê Hevalê Birahîm. Bi gihandina me re, ji bin darê derket û em pêşwazî kirin. Piştî hevdîtinekê kurt û derbasbûna şevê bi hevalekî re xatir xwest û çû û ev bû xatir xwestina dawî."

## DAXUYANÎ

Hevokên ku di wan de, cihê kirina kar hatî diyarkirin, ketine rewşek hin zelaltir de. Niha jî em temaşe bikin, çawa hinek peyv ketine rewşeke ku cihê karê didin diyarkirin.

Ew peyv û birepeyvên ku di mijarê de cihê kirina kar didin diyarkirin jê re **têrkerên cihî yên neyekser** tê gotin.

## a- Taybetmendiyên Têrkerê Cihî yê neyekser

**1-** Têrkerên cihî, ew navên ku di rewşa têdeyî, pêreyî, liserbûn, tevayî, jêreyî û alîbûn de nêzîkî karê dibin û di hêla wateyê de bi karê re têne diyarkirin.

**2-** Di hevokekê de dibe ku ji yekê zêdetir têrkerên cihî bên bikaranîn. Dibe ku ev, daçekên wan yek bin yan jî ji hev cuda bin.

**Mînak:**

→ Ez **di daristanê de**, **di rê de**, **di mal de**, **di dibistanê de**, **bi xwendekaran re** axivîm.

→ Rewşen, **di rê de**, bi hevalan re meşî.

→ Xunav, **li ser darê**, **bi çeka xwe ve** rûniştibû.

3-Navên hevalkarî yên ku daçek girtin, ji rewşa hevalkarî derketine û ketine rewşa têrkerên cihî yên neyekser.

**Mînak:**

→ Egîd **bi jor ve** çû şer.

### b-Cihê Têrkerê Cihî yê neyekser

Ciheke diyar yê têrkerên cihî tine ye. Li gor wateyê nêzîkî karê dibin yan jî tê dûrxistin.

**Mînak:**

→ Dema bihar were, pêwîst e **di welatê me de** azadî bê dîtin.

→ Sozdarê gul **bi pelan ve** çinî.

### c- Cûrên Têrkerê Cihî yê neyekser

Têrkerê cihî li gor awayê karanîn û wateya xwe dibin dû beş:

## *1- li gorî awayê karanîna xwe*

Têrkerê cihî yên neyekser cihê kirina kar, didin diyarkirin.

Têrkerên cihî yên neyekser li gor awayê karanîna xwe dibin sê beş.

### a-Têrkerê Cihî Yê neyekserê Têdeyî

Ew navên cihî yên ku bi alîkariya daçeka "**di - de**" rewşek têdebûnê nîşa dikin û cihê kirina kar didin diyarkirin re **têrkerên cihî yên têdeyî neyekser** tê gotin.

**Mînak:**

Me **<u>di hola dibistanê de</u>** gul çandin.

Têrkera cihî ya neyekserî têdeyî

Ev cûre têrkeran dema daçeka “di – de” dikeve li ser navekî, cihê kar tê de hatîkirin dide diyarkirin.

**Mînak:**

→ Min name **di lênûsê de** nivîsî.

→ Hevala Rojîn xwe **di mal de** pêşxist.

### b-Têrkerê Cihî yê Neyekserê Liserbûn

Ew navên cihî yên ku bi alîkariya daçeka "**li**" rewşek liserbûnê didin û cihê kirina kar didin diyarkirin re **têrkerên cihî yê neyekserê liserbûnê** tê gotin.

**Mînak:**

→ Wan **li dibistanê** pirtûk xwend.
Têrkera cihî ya liserbûnê
→ Wê **li çiyê** bi neyaran re şer kir.
→ Me **li Amedê** govend girtibû.

### c-Têrkerê Cihî Yê Neyekserê Alîbûn

Ew navên cihî yên ku bi alîkariya daçeka "**ji, ve**" rewşek alîbûnê didin û cihê kirina kar didin diyarkirin re **têrkerên cihî yê neyekserê alîbûnê** tê gotin.

**Mînak:**

→ Wan ew **ji Hewlêr ve** anî.
Têrkera cihî ya alîbûnê
→ Giyanê, **ji deştê ve** dar anî.
→ Av **ji bakur ve** diherike.
→ Dengê kewa **ji başûr ve** tê.

## *2 –Li Gorî Wateya Xwe*

Ev cûrên têrkeran li gor wateya xwe dibin sê beş:

### I- Têrkerê Cihî Yê neyekserê Hevpar

Ji wan têrkerên ku ji yekê zêdetir karên wan heyî re **têrkerên cihî yên neyekserê hevpar** tên gotin.

**Mîrak:**

→ Wan **<u>di mal de</u>** name nivîsî û xwendin.

Têrkera cihî ya hevpar

→ Min pirtûk <u>di refê de</u> xwend, nivîsî û anî.

→ We <u>li ser çiyayî</u> kemîn danî û li dijmin dan.

Di hevoka destpêkê de birepeyva "di mal de" têrkera cihî ya neyeksera hevpar ya kara "**xwendin**", di heman demê de ya kara "**nivîsînê"** ye jî.

Di hevoka sêyem de jî birepeyva "**li ser çiyayî**" hem têrkera cihî yaneyeksera hevpar ya kara "**danî û dan**"ê ye.

Bi vî awayî ev her dû têrker dabaşa wan tê kirin, têrkerê cihî yên neyekserên hevpar in. Ji ber her yek ji wan ji bo yekê zêdetir kara hatine bikaranîn.

## II-Têrkerê Cihî Yê neyekserê Kifşker

Ji wan peyv û birepeyvên ku têrkera cihî ya neyekser diyar dikin re **têrkerên cihî yên neyekserên kifşker** tên gotin.

**Mînak:**

→ We di mal de **<u>li ser mêze</u>** xwarin xwaribû.

Têrkera cihî ya kifşker

→ Neyar, heyînên di welatê me de, **<u>li ser xakê û binxaka welatê me</u>** talan dikin.

→ Min, li wir, **<u>di dibistanê de</u>** wêne kêşand.

Di vê derê de peyvên weke " **li ser xak û binxaka welatê me** û **di dibistanê de**" têrkerên kifşker yê ku wateya **têrkera cihî ya neyekser** diyar dike.

## III-Têrkerê Cihî Yê neyekserê Zêdeker

Ji wan peyv û birepeyvên ku peyva "**jî"** ser ve zêdebûyîn re **têrkerên cihî yên neyekserên zêdeker** tên gotin.

**Mînak:**

→We **di ref de jî** karê mal çêkir.
Têrkera cihî ya zêdeker

→ Heval **di zor û zehmetiyan de jî** li berxwe didin.

→ Gelê Penaber yê Wargeha Mexmûr **di germa havînê de jî** dixebitin.

Di mînakên jor de têrkerên cihî yên zêdeker bi peyvên weke “**jî”** hatine zêdekirin.

## PIRS

**1-** Li ser têrkera hevpar dû mînakan saz bikin.
2- Li ser têrkerên zêdeker dû mînakan saz bikin.
3- Li ser têrkerên kifşker dû mînakan saz bikin.

## B-ENDAMÊN HEVOKA NAVDÊRÎ

### 1-Destpêk:

Ew peyv yan birepeyvên ku dikevin destpêka hevoka saloxî û bi hinek peyv yan birepeyvan têne saloxdan re **destpêk** tê gotin.

**Mînak:**

**<u>Ew</u>** di biharê de xweşik e.

Destpêk

## *Destpêk li gor wateya xwe dibin sê beş:*

### a-Destpêka Vekirî:

Dema destpêka bingehîn bi hin peyv yan birepeyvan bê vekirin û hevokê bide temamkirin re **destpêka vekirî** tê gotin.

**Mînak:**

**<u>Heval Egîd</u>** **<u>Mahsum Korkmaz</u>** şoreşger bû.

Destpêk Destpêka vekirî

### b-Destpêka Hevpar:

Ew destpêkên ku ji yekê zêdetir saloxan pêşwazî dikin re **destpêka hevpar** tê gotin.

**Mînak:**

**<u>Ew</u>** jîr, ciwan, baş û rêzdar bû.

Destpêka hevpar

### c-Destpêka Zêdeker:

Dema li gel peyva destpêkê peyva "**jî**" hat zêdekirin û rewşa saloxê da pêşwazîkirin re **destpêka zêdeker** tê gotin.

**Mînak:**

**<u>Hûn jî</u>** hêja bûn.

Destpêka zêdeker

## *Destpêk li gor karanîna xwe dibe dû beş:*

### I-Destpêka Diyar:

Di hevokên navdêrî de dema destpêka wê hatibe bikaranîn re **destpêka diyar** tê gotin.

**Mînak:**

**<u>Ew</u>** ciwan e.

Destpêka diyar

### II-Destpêka Veşartî:

Ew hevokên ku tenê saloxan tên bikaranîn û destpêka wê nehatine nivîsîn re lê bi alîkariya pêvekên dem û kes yên li ser dawiya saloxê ve zêdebûyîn re **destpêka veşartî** tê gotin.

**Mînak:**

~~Ew~~ xweşik bûn.

Xweşik bûn.

### 2-Têrker:

Ew peyv yan birepeyvên ku cih û demê saloxdanê didin diyarkirin re **têrker** tê gotin.

## *Têrker li gor karanîna xwe dibe dû beş:*

### a-Têrkerên Hevalkarî:

**Mînak:**

Ew **îro** hêja bû.

Têrkera demî

### b-Têrkerên Cihî:

Zozan, **di havînê de** xweş in.

Têrkera cihî

**Têbinî**: Ji ber hemû beşên têrkeran di demê bi destgirtina endamên hevoka karî de hatine bidest girtin, jiber wê, me pêwîst ne dît li vir heman tiştî dûbare bikin.

### 3-Salox:

Ew peyv yan birepeyvên ku nav û heyînekê didin saloxdan re **salox** tê gotin.

**Mînak:**

Ew **ciwan e**.

salox

Di hevokên saloxî de endama herî girîng, salox e. Ji ber ku her salox tê wateya hevokê. Yan jî salox biserê xwe hevokê sazdike.

**Mînak:**

**Ciwan e**.

Salox

**Peyv û birepeyvên dibin salox:**

**a-Nav û pêveka demî yan jî kesî:**

**Mînak:**

Ew **mamoste ye**.

Salox

Ez **mamoste me**.

Salox

**b-Cînav û pevêkên demî yan jî kesî:**

**Mînak:**

Şervan **ew e**.

Salox

Leheng **ew bû**.

Salox

**c-Hevalnav û pêveka demî yan jî kesî:**

**Mînak:**

Egîd **mêrxas e**.

Salox

Egîd **mêrxas bû**.

Salox

**d-Hevalkar û pêveka demî yan jî kesî:**

**Mînak:**

Waneya me **îro ye**.

Salox

**e-Palvedêriya navan û pêveka demî yan jî kesî:**

**Mînak:**

Dîlan **mamosteya amadeyî ye**.

Salox

**ê-Raveka hevalnavan û pêveka demî yan jî kesî:**

**Mînak**:

Dara **xwendekarek jîr e**.

Salox

## ENDAMÊN JI DERVEYÎ HEVOKÊ

## XEBATÊN AMADEKARIYÊ

Di van pênc beşên dawî de li ser endamên hevokê hat rawestandin. Ew jî kar û kirek endamên bingehîn, pêkir, têrker, endamên alîkar in. Gelo di hevokê de peyv yan jî birepeyvên karê bandor nekin hene?

Di hin hevokan de peyvên bangkirin û peyvên axaftinê yên ku tên dîtin, dibin kîjan endamên hevokan?

Di lêkolînkirina hevokan de, ev çawa tên şirovekirin? Ev nebin jî hevok tên sazkirin? Li jêr hûnê veqetandekê bixwînin û hûnê balê bikişînin li ser peyv û birepeyvên reş hatine nivîsandin. Hûnê bihizirin ka ev ji hevokê re pêwîst in yan ne?

**PARÇEYEK JI DAXUYANIYÊ**

**“**Gelê birûmet! Ev demeke neyarên gelê Kurd li hev kom dibin. Leşkerê xwe jî tangên xwe jî anîne li ser tixub. Ax! Ev çi xirabî ye, piştî ev qas sal neyarên gelê Kurd xwînmêjiya xwe didomînin. Neyar dixwazin hinek din jî Kurdan bindest bihêlin – her weku Kurd bindest nemayîn da ku li gor berjewendiyên xwe mafê Kurdan bidin.”

***DAXUYANÎ***

Di hevoka destpêkê ya bendê de birepeyva “**gelê birûmet**” ev ne hevokek e û ne endamek yê wê hevoka pê re hatî bikaranîne jî ev birepeyvek ya axaftinê ye. Em nexwînin jî hevok wateyek tekûz dide.

Dîsa peyva “**ax**” peyveke bangî ye, şiyariyekê çêdike lê ev jî ne endamê hevokê ye. Birepeyvên **“her weku Kurd bindest nemayîn.”** Ev nabe hevok û ne endamê wê hevokê ye jî. Endamên di avakirina hevokê de cih nagirin û karê bandor nakin lê belê neyêkser peyv û birepeyvên ji wateya hevokê re dibin alîkar; jê re **endamên ji derveyî hevokê** tê gotin.

Di hevokê de peyv û birepeyvên dibin endamên ji derveyî hevokê ev in; “**peyv û birepeyvên bangî.”**

**Mînak;**

“**Ax dayê**! Ma çima ev qas cîhan xirab e?

Xirabê wê pir in, tiştek bê wan çênabe?”

Birepeyva **“ax dayê**” ya di malika jor de derbazbûyî birepeyva bangî ye.

**Gelê hêja**! "Hûn dizanin pêwîst e em birêxistin bibin, ger em xwe birêxistin nekin, emê têk biçin.”

Birepeyva “**Gelê hêja**” ya ku di vê hevokê de reş hatî nivîsandin, birepeyva bangî ye.

Mamoste xwest, Hogir bê dibistanê **her weku Hogir yekcar nayê dibistanê** ji bo wana bibîne.

Birepeyvên ketin navbera herdu xêzikên navber ne endamê vê hevokê ne belkî gotinên navber in.

## PIRS

**1-**Di hevokên jêr de endamên ji derveyî hevokê bibînin.

**a-** Of! Zozanê, daristan şewitand.

**b-** Xwendekarên delal! Pêwîst e hûn li ser wanaya xwe bixebitin.

2-Cûrê van endamên ji derveyî hevokê  bidin diyarkirin.

## TEST

**1-** Di vê malika jêr de çend kar hene?

“Gul heye em dizanin,
Hem rind in hem ciwan in,
Bixudê ne erzan in,
Ji bo wê ketim xewê de.”

**a-** 1 **b-** 3 **c-** 5 **d-** 7 **e-**2

**2-** Di kîjan hevoka jêr de hevsengî di navbera kar û kirekê de nîne?

**A)** Bi van bûyeran zarok ditirsin.
**B)** Tirk û Ewrûpiyan dest bi hevdîtina kirin.
**C)** Wan nameyê nivîsî.
**D)** Mêvanên me hatin.
**E)** Havîn, çû zozana.

**3-** Kireka kîjan hevokên li jêr kireka qaşo ye?

**A)** Nêrgiz ji malê hat.
**B)** Dara ket.
**C)** Piştî Zozan ji mal hat, ez çûm.
**D)** Gul ji darê ket.
**E)** Baran ji ewran tên.

**4-** Di kîjan hevokên jêr de pêkira nediyar heye?

**A)** Hozan li tembûrê dixe.
**B)** Şivan diçe ber pezî.
**C)** Bêrîvan pezî didûşin.
**D)** Egîd pirtûkek xwend.
**E)** Dilvîn şervan e.

**5-** Bersiva kîjan hevokên pirsyarî yên li jêr têrkera cihî ya yekser e?

**A)** Axaftina min çima tû ev qas bandor kirî?

**B)** Tû dixwazî çi bêxî vê odê?

**C)** Tişta tû li dibistanê fêr dibî, tû dê li kûderê bêxî pêkanînê?

**D)** Dema tû ji dibistanê derdikevî, tu rasta kê têyî?

**E)** Îşev hûnê çawa derbaz bikin?

**6-** Di Kîjan hevokên li jêr de, tenê hevok ji karê pêkhatiye?

**A)** Berfa çiya dihele.

**B)** Azad, şehîd ket.

**C)** Gulan bi gula hatiye xemilandin.

**D)** Hatin.

**E)** Gul vebûn.

**7-** Kîjan endamên li jêr di vê hevokê de nîne?

"Evîna leheng li çiyê bi neyaran re şer kir."

A- Kirek B- Kar C- Pêkir D- Têrkerên hevalkarî E- Têrkerên cihî

**8-** Di kîjan hevokên jêr de têrkerên hevalkarî nîne?

**A)** Tû îro bi kê re axivî.

**B)** Vîndarê, çîrokek, dirêj dirêj got.

**C)** Tû kengê hatî?

**D)** Me mehekê gelek diravan mezaxtin.

**E)** Her roj piştî roj derdikeve xebat destpêdike.

**9-** Di kîjan hevokên jêr de jimara endamên hevokê zêdetir e?

**A)** Gula sora çilmisî, li deşta bê av şîn dibe.

**B)** Havîn li zozanan bilez dest pê dike.

**C)** Wî li Zapê bi neyaran re xweş têkoşîn kir.

**D)** Daristana şîn a Kurdistanê di demsala biharê de bi rengê cûr be cûr tê xemlandin.

**E)** Rojbîn, li binê dara sêvê rûnişt.

**10-** Di kîjan hevokên jêr de tevayî peyvên ketin pêşiya karê, bes kirekê sazdikin.

**A)** Sosinê ji mêrgê giya dirû.

**B)** Evîndara giranbiha ya binav û deng hat dibistanê.

**C)** Sêvê sêv xwar.
**D)** Gelê me di daristanê de xêvetên xwe vedan.
**E)** Min di refê de pirtûk xwend.

**11-** Kîjan hevokên li jêr, awayê rêzkirina wan “kirek, pêkir, têrkera hevalkarî û kar” bi vî awayî ye?

**A)** Spêndar li gelî şîndibin.
**B)** Sîpan, çû dibistanê.
**C)** Rohat, di dibistanê de fêrî xwendin û zanistê bû.
**D)** Rojhat, pirtûk êvarî anî.
**E)** Şevê din birq deh caran çû û hat.

# BEŞA 3.

## CÛRÊN HEVOKAN

## 1- HEVOK LI GOR CÛRÊ KAR Û REWŞÊ

### XEBATÊN AMADEKARIYÊ

Dema hûn daxivin yan jî dinivîsin, hûn balê dikişînin ka karên hevokan ji kîjan cûrê kar yan jî saloxa ne. Dema hûn bûyerekê radigihînin yan jî wateya wê temam dikin, hûn kîjan peyvê di kirina wê hevoka we bikaranî de bikartînin, nav yan kar e?

Balê bikişînin li ser karên di benda jêr de. Nivîskar kengê kar, kengê salox bikaraniye.

**PARÇEYEK JI BÎRANÎNÊ**

Zinarek li hemberî min bû dayê. Min xwe bi wî zinarî girt, ez reviyam. Min çend gav ne avêtibûn, li paş min dengek zelal û şîrîn hat bihîstin. Wî dengî ji min re got: “Leşker tû bi kûde direvî ji mirinê rev heye?”

Di vê  parçe bîranîna li jor de pênc hevok hene. Dema em temaşeyî karên wan hevokan dikin, têdigihin ku dû cûrên hevokan hatine bikaranîn.

**Li gor cûrê karan û saloxê hevok dibin dû beş:**
**a- Hevoka Navdêrî**
**b- Hevoka karî**

## a- Hevoka Navdêrî (Saloxî)

Di benda jor de peyva “**min bû**” cînav e, hevok li ser hatiye avakirin. Vî navî pêveka dema borî girtiye.

Ew hevokên li ser saloxê tê avakirin jê re **hevokên navdêrî** tên gotin.

**Mînak:**

→ Ew dengê xweş yê kewê ye.
→ Pirtûka xweş ya hevala ne.
→ Awazê bilbil gelek xweş e.

Ev cûre hevok, hevokên saloxî ne.

## b- Hevoka Kiryarî

Peyvên weke “**girt, reviyam, bihîstin, got û direve**” yên ku di mijara xebatên amadekarî de derbazbûyîn, kirinên karîne. Ev cûrê karan, kirina karekê didin diyarkirin. Dema hevok li ser karê tê avakirin jê re **hevokên karî** tê gotin.

**Mînak:**

→ Hogir xwe **nexapîne**, emê li jor karekî **bikin**.
→ Hogir ji nişka **vetewa.**
→ Serdevka li ser kuçxana goşt **rakir**.
→ **Dixwest** hinekê **derxe** lê ji ber kela zêde nekarî **derxe**.

Dema em karên di van mînakên derbazbûyî de lêkolîn dikin, dibînin ku kirina karekê didin diyarkirin. Ji ber vê em têdigihin ku kar in.

## PIRS

1- Li ser salox û karan du mînakan saz bikin.

2- Cudabûna di navbera kar û saloxên van mînakên li jêr yên ku weke du hevokan li pey hev hatine de bidin diyarkirin.

→ Ez îro ji duh pitir westiyam. Ez îro ji duh pitir xebitîm.

→ Daristan şewitiye. Daristan şewitandin.

→ Ev hinar sor e. Ev hinar reşkirin e.

→ Ez dinivîsim. Pirtûk nivîsînek e.

## 2- HEVOK LI GOR WATEYA XWE

### XEBATÊN AMADEKARIYÊ

**→ Diljîn, çû dibistanê.**

**Di vê hevokê de karê çûyînê pêkhatiye, yan ne?**

**→ Diljîn tevlî vê meşê nebû.**

**Li gorî vê hevokê Diljîn tevlî vê meşê bûye?**

**→ Sorgul jî tevlî vê meşê bûye?**

**Li gorî vê hevokê dixwaze çi fêr bibe?**

**Di mînakên jor de, hevokên dimînin hev hene. Balê bikişînin li ser wateya wan gelo di kîjanê de kar hatiye kirin, di kîjanê de kar nehatiye kirin û di kîjanê de kirina kar hatiye pirskirin; fêr bibin.**

**ÇEND HEVOK LI SER HEVOKA ERÊNÎ Û NERÊNÎ**

→ Dengê bilûrê xweş e. Ji ber ji çanda gelê me yê kevnar tê. Dengê neyaran nexweş e. Ji ber bihovitiya xwe dengê xwe di dilê me de reşkirin e.

→ Dengê kewan xweş e?

Di mînakên jor de peyva "**xweş e**" rewşek daye diyarkirin. Peyva "**nexweş e**" nepêkhatina rewşekê daye diyarkirin. Peyva "**xweş e**" ya pirsyarî ji bo diyarkirina rewşekê pirskiriye.

## *DAXUYANÎ*

Li jor me sê hevok li ser gera Diljînê xwendin.

Karên van hevokan peyvên "**çû, nebû, bûye**" ne.

Di ya yekem de karek hatiye kirin.

Di ya duwem de nekirina karekê hatiye diyarkirin.

Di hevoka sêyem de jî hatiye pirskirin.

Di van mînakan de li gor wateyê sê cûrên hevokan hene: Hevoka erênî, hevoka nerênî, hevoka pirsyarî.

### a- Hevoka Erênî

→ Ava Zapê xweş diherike.

→ Havîn germ e.

→ Di nav germa havînê de, em dixebitin.

Di van mînakan de rewş, kar û çêbûnên kar û saloxên wan didin zanîn, pêkhatiye yan jî dibe ku pêk were.

→ Pênûsên wê yên ciwan û xweşik hene.

Di vê hevokê de hebûn tiştekê dide diyarkirin.

Dema karê pêkanîna karekê bûyî yan dê bibe ragihîne yan salox heyîna tiştekê ragihîne jê re **hevoka erênî** tê gotin.

Têbînî:

Dema pêvek “**ne**” li pêşiya kara nerênî tê bikaranîn, hevok li gor wateya xwe dibe erênî.

“Kovan pirtûk nenexwendiye.”

## b- Hevoka Nerênî

Karê hevoka duwem “nebû” ya di xebatên amadekarî de dide diyarkirin ku “Diljînê” karê meşê pêk ne aniye.

Dîsa di xebatên amadekarî de peyva “nexweş e”

Bi vê saloxê daye diyarkirin ku dengê neyaran nexweş e.

→ Rastî em binêrîn leşker nîne, pergal nîne, dirav nîne û ji teva xirabtir deshilatî nîne.

→ Duristî netal e.

→ Dem nehatiye.

→ Kurd bi hev re alîkariyê nakin.

Dema em temaşeyî van hevokan dikin, dibînin ku peyvên “nîne, **netal e, nehatiye, nakin**” kirina kar çênebûye dê çênebe yan jî nepeydabûn, nebûna tiştekê didin diyarkirin.

Dema pêvekên nerênî “ne, na” ketin li ser kar yan jî saloxê ew hevok dibe nerênî.

Hevokên çênebûna karê karê, yan jî neçêbûna saloxê didin diyarkirin jê re **hevokên nerênî** tên gotin.

## c- Hevokên Pirsyarî

Ew hevoka ku pirsê ji kar yan jî ji rewşê dike re **hevoka pirsyarî** tê gotin.

Di hevokên pirsyarî de yan peyvên pirsyarî cih digire yan jî ev hevok bi lêdana dengek bilind diyar dibin.

**Mînak:**

→ Destpêkê rewşa te çi ye?
→ Tû çi dikî?
→ Neyar dixwazin bikevin başûr, ma ji ber Tevgera Azadiyê tên?

Kara van hevokan her yekê tiştekî dipirse û bersiva wê dixwaze. Bi boneya kesên nizanin bi armanca fêrbûnê, ev pirs hatine pirskirin.

Hevokên pirsyarî yên biwateyên ku bersivê dixwazin jê re **hevoka pirsyarî** tê gotin.

Li dawiya hevokên pirsyarî her tim nîşana pirsê tê bikaranîn.

Kara hevokên pirsyarî dibe nerênî jî be. Ji cûre hevokên bi vî awayî re jî **hevokên pirsyarî** tê gotin.

**Mînak:**

Hevalan kengê karê mal çênekirine**?**

## PIRS

1-Hevoka erênî bi mînakan vekin.
2-Li ser hevoka nerênî dû hevoka sazbikin.
3-Dû hevokên nerênî yên saloxî sazbikin.
4-Sê hevokên pirsyarî yên saloxî sazbikin.
5-Çar hevokên pirsyarî yên karî sazbikin.

## 3- Hevok Li Gor Çêbûnê

**Hevok li gor çêbûna xwe dibin çar beş:**

### a- Hevokên Hêsanî

Ew hevokên ku tenê karek yan jî saloxekê pêşwazî dike re **hevokên hêsanî** tê gotin.

**Mînak:**

Wan nivîsandin gava din hêdî hêdî nivîsîn.
Gelek hatin.

Ew dar geş bûn.

## PIRS

**1**- Di benda jêr de hevokên hêsanî bibînin.

“Rojek ya biharê bû, xwendekar û mamoste derketibûn geştê. Li dibistanan tu kes nema bûn. Ji nişka ve min dît. Bayekî pir dijwar radibû. Saçên li ser dibistanê difirandin. Ji hewa ve dengek dihat û bang dikir, raweste!”

**2**-Hevoka hêsanî bi mînakan vekin.

## b- Hevokên Rêzî

Ew hevokên ku ji yekî zêdetir karan bi rêze ve dike yan jî yekê zêdetir salox tên bikaranîn re **hevokên rêzî** tê gotin.

**Mînak:**

Ew çû dibistanê, perwerde dît, vegeriya malê.

Ew pir jîr e, zana ye, rêzdar e.

Li vê derê kirek yan jî destpêk bi tenê ye, bi awayek li pey hev hevok dane rêzkirin. Her hevokek ji van her çiqas hêsanî jî bin, ji ber ku karên hatin kirin li pey hev hatine rêzkirin, hevok bi bêhnokan hatine girêdan û cihên çûyiyê di nav temamkirina wateyekê de tên bikaranîn.

Hevokên bi tena xwe darezandinekê didin zanîn, di nava wateyek tevayî de hatîn rêzkirin re **hevokên rêzî** tên gotin.

**Mînak:**

**“Mamoste dixwîne; dinivîsîne, zanadike, pêşdixe.”**

Ji bo em serkeftî xebatên xwe berdewam bikin, dixwînin, dinivîsînin.

Li vir kesekê karê xwe bi rêzê ve aniye ziman.

Hevokên rêzê bibandorekê di heman demê de yan jî bi kirekên cuda, karên hatîn kirin, jimartin, rêzkirin, karên heman kirekê li pey hev kirin, ji bo gihandina wan ya hev tên bikaranîn.

“**Biharek nû hat Kurdistanê, berf heliyan, av herikî, xaka bê av mayî hat avdan, her der şîn bû.”**

Di vê hevoka duwem ya mijara jor de bûyerên hatîn rêzkirin sedemên wan hatina biharê ye.

Bi biharê re bûyerên bi hev ve girêdayî çêdibin, guhartinên têne holê hatine rêzkirin.

**PIRS**

1- Hevokên rêzî yên di mînakên jêr de bidin diyarkirin.

a) “Dema Rêber helbestekê dibêje; Ji qirikê deng derdikeve, dizivire, diçe pêş, diçe paş, bi awayek nexweş tê guhê mirovan.”

b) Dema Nermîn ji mal derdikeve pêlava xwe dixe lingê xwe, li derdora xwe dinêre, deriyê hewşê vedike, bi awayek lezgîn tên ser rê, diçe dibistanê.”

**2-** Kirekên van hevokên rêzî yên we di mijarên jor de dîtîn. Lêkolîn bikin.

### c- Hevokên Gihanek

Ew hevokên ku bi alavên gihanekê bi hevdu ve hatîn girêdan re **hevokên gihanekî** tê gotin.

**Mînak:**

Ew nameyê dinivîse û hevala wê jî guhdar dike.

Ew giya şîn e lê kulîlka wê sor e.

Rêber çû Amedê û piştî sê rojan zivirî.

Peyva gihanek ya ketî navbera van herdu hevokan çi kar kiriye?

Dema em wê di navbera van herdu hevokan de bikarneyînin cudabûnek ji ya destpêkê cuda çêdibe?

Di mijara jêr de, di navbera hinek hevokan de peyvên gihanek hatine bikaranîn. Dema we mijar xwend, temaşe bikin di hêla wateyê de van peyvên gihanek çi kirine.

"Pir guman tên kirin ku beşekî yê Kurdan yê li rex dijmin cihbigire lê belê newisan e. Peywendiyên di navbera gelê Kurd de ji berê zêdetirin û ez bawer im dê baştir jî bibin."

***DAXUYANÎ***

Di mijara jor de peyvên **"ku, lê belê, û"** di navbera du hevokan de girêdan çêkirine.

Hûn dizanin ev alavên girêdanê ne.

Dema peyvên bi vî awayî di navbera du hevokan de tên bikaraîn û di hêla wateyê de hevokan bi hev ve girêdidin; ji girêdana navbera van hevokan re **hevoka gihanek** tê gotin.

Ji bo hevokên girêdayî herî zêde peyvên gihanek yên weke "û, ku, lê, lê belê, yan, yan jî, jî" tên bikaranîn. Hevokên bi van gihanekan bi hev ve tên girêdan, her qas dibe ku endamên wan hevpar bin, weke wan dibe ku endamên wan jî ji hev cuda bin.

Ger kirekên wan, karên wan, raweyên di karên wan de û pêvekên kesî heya wateya wan jî cuda bin, bandorê li sazkirina hevokê nakin.

**Mînak:**

**Û:** Rizgar ket kemînê û derbeyek mezin li neyaran xist.
**Ku:** Xebat pir hatkirin ku Kurdan ji bindestan derxin.
**Lê:** Mamoste waneyê dide lê tu kes di refê de nîne.
**Lê belê:** Ez bi te re dixebitim lê belê karên min yên din jî hene.
**Yan:** Rewşê bi telefonê fêrbibe yan bi xwe biçe wir.
**Jî:** Egîd jî hat Ronî jî hat.

## PIRS

**1**- Di mijara jêr de gihanekên heyîn peydabikin?
“Dengek tê guhê min,
Lê windabû nehal e,
Agir berda dilê min,
Her kir pêt û duxan e
Kurdno werin bixwazin,
Belê biserferazî,”
**2-** Hevokên li jêr bi gihanekekê di cih de bi hev ve girêbidin.
a- Xwendekaran pirtûk anîbûn ⋯ mamoste ne amade bûn.
b- Tirambêl ji Hewlêrê derket ⋯ baran barî.
d- Tu carekê dimirî, azad dibî ⋯ ez çiqas te li bîrbînim, ezê bimirim.

## d - Hevoka Hevgirtî

## XEBATÊN AMADEKARIYÊ

Li gor çêbûna xwe hevoka hevgirtî jî cûrek ji wan hevoka ne. Wateya peyvên hevgirtî di rêziman de hûn zanin. Weke çawa peyvên hevgirtî, raweyên hevgirtî û di nava xwe de dibe ku çend endamên wan hebin, hevokên hevgirtî jî hene.

**Mînak:**

Daristanê neparêzin, dê bişewitin.
Di vê hevokê de çend hevokên hêsanî hene?
Dibe ku mirov van hevokan ji hev cuda bike.
"Dibêje dayê, bavê min dê te bibe geştê were, biçin."

## *DAXUYANÎ*

Di hevoka mînaka destpêkê de, bi rastî dû hevok hene. Hevoka yekem "di nava daristanê de neparêzin", hevoka duwem "dê bişewitin" e.

Kara hevoka yekem pêveka karê ya kom û kesî ya dema bê girtiye û kara wê di rewşa mercî de ye.

Hevoka duwem jî di hêla pêvekan de, di heman rewşê de ye.

Hevoka ji hevokekî bingehîn ji yek yan zêdetir hevokên alîkar tên holê re **hevoka hevgirtî** tê gotin.

Hevoka hevgirtî di nava xwe de dibin dû beş:

1-Hevoka hevgirtiya mercî

2-Hevoka hevgirtiya di nava hev de

## 1-Hevokên Hevgirtiya Mercî

- Te berdim, tû wê bikevî kolanê.

Di rêzikê de hevoka bingehîn “tû wê bikevî kolanê” ye. Hevoka alîkar jî hevoka destpêkê “Te berdim” ye.

Hevoka mercî ya ku li destpêkê tê sedemê dide diyarkirin û weke hevokek alîkar tê bikaranîn. Dihêle ku mirov nikaribe van weke ji dû hevokên hêsanî jî cuda bike.

Hevokên, hevoka wê ya alîkar mercî be û ji dû hevokan pêkhatibe jê re **hevokên hevgirtiya mercî** tê gotin.

**Mînak:**

Ez xemgîn rawestim, dê dil bibe birîn.
Hevoka alîkar hevoka bingehîn
Tu kêrê lêbidî, dê xwîna germ derkeve.
Hevoka alîkar Hevoka bingehîn

## 2-Hevokên Hevgirtiya Di nav Hev De

Ev cûrehevok piranî di ragihandinan de tê bikaranîn. Dema kes bixwaze gotinekê ragihîne vê cûrehevokê bikartîne.

Di xebatên amadekarî de hevoka “Dibêje dayê, bavê min dê te bibe geştê were, biçin!” Tê dîtin.

Dema em temaşeyî vê hevokê dikin, dixwaze tiştekê ragihîne vê hevokê sazdike.

Weke di vê mînakê de jî derbazbûyî, hevokek derbazî nava hevokek din dibe, hevoka ji van tên sazkirin re **hevoka hevgirtiya di nav hev de** tê gotin.

**Mînak:**

Ji bo rastiyê fêr bibin, lêkolîn dikin.

**PIRS**

**1-** Di hevokên hevgirtiyên li jêr de temaşe bike û hevoka alîkar û hevoka bingehîn bidin diyarkirin.

**a-** Mamoste binivîse, dê hewbibe.

**b-** Nederketa, nediket.

c- Demê Newrozê ye, rabe.

**2-** Hevokên ketî yên di mînakên jêr de bi awayekî di cih de temambikin.

a- Rêbaz ………… dê serbiketa.

b- Xatûnê binivîsiya ……… baştir bûya.

3- Hevokên hevgirtiyên di benda jêr de peyda bikin.

15'ê Tebaxê nêzik bûye, ger hozan xweş bikin, dê gêwilê gel xweş bibe. Ger xweş nekin, dê gêwilê gel xweş nebe.

Ez bawer im, dê hozan xweş bikin.

5- Hevokên we peydakirin ji kîjan cûrên hevokên hevgirtî ne? Bidin diyarkirin.

## 4- HEVOK LI GOR CIHÊ KAR Û SALOXÊ

## XEBATÊN AMADEKARIYÊ

Yek ji cudabûnên mezin yê di navbera zimanê axaftinê û nivîsînê de, di hevokê de hatina karê di cihên cuda de ne. Di zimanê axaftinê de bi awayek giştî endamên hevokê bi taybet kar dibe ku ne di cihê xwe de bê bikaranîn. Li hevoka jêr temaşe bikin.

"Tênegihiştim axaftinên we, herim, bixwim nanî li wir. Bêje zû."Bi hevokên mîna van, em dikarin baxivin,lê belê hinek dixwazin van bêxin nava zimanê nivîsînê jî. Zimanê nivîsînê hêj zêdetir girêdayî destûrên rêzimanî ne. Piranî kar li dawiya hevokê tê bikaranîn.Dema kar li dawiya hevokê be, wateyê diguhare? Li van mînakên jor binêrin û bixebitin da ku hûn vê fêr bibin.

Mijara li jêr bixwînin; temaşe bikin kar li kûdera hevokê hatiye bikaranîn?

**PARÇEYEK JI AXAFTINÊN ROJANE**

"Hatim îro ez ji dibistanê, hatibû girtin riya me bi daran. Ji bo derbas bibin me banî duzerê kir. Bi alîkariya derdor me rê paqij kir. Piştî wê em derbasbûn. Bi rê ve çûyîn heya gihiştin şaredariyê.

Tirampêlek hat li rex me rawestiya, em li tirampêlê siwar bûn, hatin mal û bi vî awayî rêwîtiya me dawî lê hat.”

***DAXUYANÎ***

Dema em temaşeyî benda jor dikin, dibînin ku di mijara destpêkê de hevoka yekem û duwem karên wan ketine destpêka hevokan. Di hinek hevokên dawî de kar ketiye nava hevokê. Bi vî awayî em têdigihin ku li gor cihê karan hevok dibin dû beş:

Hevoka kara wê dikeve dawiyê yan navê û kirek dikeve destpêka hevokê; em ji vê hevokê re dibêjîn **hevoka bidestûr**.

Hevokên ku karên wan dikevin destpêka hevokê yan jî dema pêkir li destpêkê û kirek di navê de tê jê re **hevokên bêdestûr** tên gotin.

**Têbînî:**

Di zimanê Kurdî de, carna kara hevoka bidestûr (bi taybet dema peyva “**hat û çû**” bibe kar) dikeve nava hevokê.

## a-Hevoka Bidestûr

Li gor zimanê Kurdî bi awayê giştî endamên alîkar dikevin destpêka hevokê û endama bingehîn dikeve dawiya hevokê. Ji ber wê kara ku di hevok de peyva bingehîne, yan dawiya hevokê yan jî li nava hevokê tê dîtin. Hevokên bi vî awayî di hevokên jêr de tên dîtin.

→ Roj çi bîne, ezê wê binivîsînim.

→ Pirtûka min xwendî, tiştekê bi min dide hizirandin, ezê wê binivîsînim.

→ Ez dereng razam.

→ Îsal bi taybet berf jî nebarî.

→ Na, yekser jê heznakim.

*Hevokên ku kirek bikeve destpêkê û kar bikeve dawî yan navê, ji wan re **hevokên bidestûr** tên gotin.*

**Mînak:**

“Heya dawî hevalên me dev ji me bernedan.”

“Di demê kevnar de Kurd koçber bûn, ji beriya her kesê bi xakê ve hatin girêdan.”

Di van mînakên jor de hevoka yekem, karek heye û ketiye dawiya hevokê. Di hevoka duwem de jî dû kar tên dîtin, her dû kar jî dikevin dawiya hevokê.

## b- Hevoka Bêdestûr

Hevokên bêdestûr, ew hevokên ku karên wan, dikeve destpêka hevokê yan jî pêkir li pêşiya kirekê tê bikaranîn. Ev cûre hevok piranî di pendên pêşiyan de, di hûnandiyê de, di roman û çîrokên cih didin axaftina rojane de tên bikaranîn.

**Mînak:**

**Pendên pêşiya:** *“**Sax dibe** cihê xenceran, **saxnabe** cihê xeberan.”*

**Helbest:** ***“Hat** gula mina ciwan,*
*Di dest de ben û teşî,*
***Bandike** bidil û can,*
*Çi heşî ye û çi reşî.”*

**Axaftinên rojane**

- Tu li vir benda kê **rawestayî**?
- **Nehat** hevala Dilvîn?

Hevokên ku kar dikeve destpêkê yan jî pêkir dikeve pêşiya kirekê jê re **hevokên bêdestûr** tên gotin.

## PIRS

1- Dû mînakan li ser hevoka bidestûr sazbikin.

2-Hevoka bêdestûr bimînakan vekin.

## TEST

**1- “Ez çûm gera Amedê, da biçim pêş kelhê.”** Li gor vê hevokê vebijêrkên jêr kîjan rast e?

A- Hêsanî - nerênî – bidestûr – hevoka navdêrî
B- Hevoka hêsanî – erênî – bidestûr – karî
C- Hevgirtî – erênî – bidestûr – hevoka karî
D- Hevgirtî – nerênî – bêdestûr - hevoka karî
E- Hevgirtî – erênî – bêdestûr – hevoka navdêrî

**2- “**Ew <u>îro</u> çû dibistanê.” Di vê hevokê de peyva binê wê hatî xêzkirin, erkê wê kîjan ji yên jêr e?

A- Kirek   B- Pêkir
C- Têrkera Hevalkarî   D- Kar   E- Têrkera cihî

**3-** Kîjan ji van hevokên li jêr di hêla wateya xwe de ne hevoka pirsyarî ye?

A- Di vê mijarê de hûn çi dihizirin?
B- Tû çima pirtûkên xwe nayînî dibistanê?
C- Dema tû hatî te ji hevalê xwe re got?
D- Ma hema min çi xêr ji we dîtiye?
E- Tû çiqas destûrê dixwazî?

**4-** Kîjan hevokên li jêr, hevoka nerênî ye?

A- Hûnê kengê bên?
B- Xwendekarên vê refê pir neserkeftîne?
C- Rêber ji Botanê ve hat.
D- Çawa çêbû?
E- Di rojekê de digeriya û radiwestiya?

**5-** Kîjan ji van hevokên li jêr ne hevoka bêdestûr e?

A- Rizgar cilên werzîşê dixwaze ji min.
B- Diherikin çi stêr li esmanan?
C- Gula biharê pir ciwan e.

D- Hilavêt gelavêjê.
E- Hat birq.

**6-** Ji hevokên li jêr kîjan li gor kara xwe cuda ye?
A- Gava din kilîlek xistin derî.
B- Jinek bêpêjin ket hundir.
C- Hogir pêl li pehniya hevalê xwe kir.
D- Yek yek li tevayî oda temaşe kir.
E- Tû kes di vê kelhê de nîne.

**7-** Ji van hevokên li jêr kîjan li gor çêbûna xwe ji yên din cuda ye?
A- Neyaran li welatê me, daristan şewitandin.
B- Gelê Kurd berxwedanvan e.
C- Gerila di nav daristanê re derbaz dibin.
D- Bihar hat.
E- Firat ji ber hatina bahozê, nikare binivîse.

8- Kîjan hevoka li jêr hêsanî- bêdestûr- erênî – karî ye?
A- Herim malê ez.
B- Bêrîvan neçû malê.
C- Nûjînê îro pirtûk xwend.
D- Dilovan di refê de peyvî.
E- Delalê ji Dilvînê re diyariyek anî.

9- Di kîjan mînakên jêr de, hevoka hevgirtiya di nav hev de ye?
A- Ji bo we xebat kirin erkê min e.
B- Ew çiqas xebatkar e.
C- Heval Hozan ban kir te.
D- Wan gotin.
E- Deşta Mexmûrê bigenim e.

10- **“Dema tişta hatî serê min, hevalê min têgihişt got; gunehê te ye.”** Li gor çêbûna xwe ev hevok ji kîjan vebijêrkên jêr in?
A- Hevoka hêsanî B- Hevoka Rêzî
C- Hevoka hevgirtiya mercî D- Hevoka gihanek
E- Hevoka hevgirtiya di nav hev de

# BEŞA 4.

## ÇARESERKIRINA HEVOKAN

### XEBATÊN AMADEKARIYÊ

Di vê beşê de, xebatên ji berê ve hatîn têgihiştin yên di derbarê mijara hevokê de dê bê çareserkirin.

Çareserkirina hevokê, tê wateya, diyarkirina endamên hevokê tînin hole ye.

Bi awayek baş têgihiştina vê, dema dinivîsîn û dipeyvîn karanîna peyvan ya di cihê wan de ji karanînê re dibe alîkar.

***Çareserkirina hevokê bi sê riyan çêdibe.***

**Riya I:** Cûrên hevokan. We, ev di beşên hevokan de dîtine. Di vê rê de çêbûna hevokê li gor cûrên karan, cihê kar û li gor wateya hevokê dê cûrên wan bidin diyarkirin.

**Riya II**: Edamên hevokê. Di vir de endamên ku hevokê tînin holê dê bên dîtin. Kirek, kar, pêkir, têrkera cihî ya neyekser, têrkera hevalkarî, têrkera cîhî ya yekser û endamên ji derveyî hevokê yan jî kara bi pêveka raweyê hatî kêşan û pêvekên kesî dê bên diyarkirin.

**Riya III:** Birepeyv. Di vê derê de endamên ku hevokê tînin holê, ger ji yekê zêdetir ji peyvan pêkhatibe, dê çêbûna wan bê lêkolînkirin.

Piştî dayîna mînakekê biçûk çareserkirina hevokê dê dest pê bike.

**“Şaristana Girigî îro di refê de pirtûk xwend.”**

**Cûrên hevokê**

**Riya I:**

a- Çêbûna hevokê: Hevoka hêsanî
b- Hevok li gor cûrê kar û rewşê: Hevoka karî
c- Hevok li gor cihê kar û saloxê: Hevoka bidestûr
d- Li gor wateya hevokê: Hevoka erênî

**Endamên Hevokê**

**Riya II:**

a- Şaristana Girigî: kirek
b -Îro: Têrkera hevalkarî
c- Di refê de : Têrkera cihî ya neyekser
d- Pirtûk: Pêkir
e- Xwend: Kar

**Birepeyv**

**Riya III:**

Şaristan a Girigî
Nav veqetandek Nav
Palvedar Palvedêr
Palvedariya navan

**MÎNAKÊN ÇARESERKIRINA HEVOKÊ**

## 1-Hevokên Hêsanî

**“Wan gava din gula sor a bêhn xweş neçinîn.”**

**Cûrên Hevokê**

**Riya I:**

a- Hevoka hêsanî

b- Hevoka karî
c- Hevoka bidestûr
d-Hevoka nerênî

**Endamên hevokê**

**Riya II:**
a- Wan: Kirek
b- Gava din: Têrkera Hevalkarî
c- Gula sora bêhnxweş: Pêkir
d- Neçinîn: Kara nerênî

**birepeyv**

**Riya III:**
Gava din :Birepeyvên hevalkarî

| | | | | |
|---|---|---|---|---|
| Gul | a | sor | a | bêhnxweş |
| Nav | V. | hevalnav | V. | |
| Raveber | | raveker | | |

Raveka hevalnavan

**“Li gir bi stûna spî ve xweş xweş dihejiya al.”**

**Cûrên hevokê**

**Riya I:**
a- Hevoka hêsanî
b- Hevoka karî
c- Hevoka bêdestûr
d- Hevoka erênî

**Endamên hevokê**

**Riya II:**
**a-** Dihejiya: Kar (demê niha)
**b-** Al**:** Kirek
c- Li gir : Têrkera cihî liserbûn

d- Bi stûna spî ve: Têrkera cihî ya pêveyî
e- Xweş xweş :Têrkera Hevalkarî

## Birepeyv

**Riya III:**

a-Li gir:
Daçek nav
Birên daçekî

b- bi stûn a spî ve:
Daçek Nav veqetandek Hevalnav p.
Raveber raveker
Raveka Hevalnav
Birên Alavên daçekê

c- xweş xweş
Bire peyvên dubare
Hevalkar

**"Dar çend mehên din wê şîn be."**

## Cûrên Hevokê

**Riya I:**

a- Hevoka hêsanî
b- Hevoka saloxî
c- Hevoka bidestûr
d- Hevoka erênî

## Endamên Hevokê

**Riya II:**

**a**- Şîn bû: Saloxa erênî
**b-** Dar**:** Destpêk
c- Çend mehên din: Têrkera hevalkar

**Birepeyv**

**Riya III:**

**a-** Çend meh ên din

Hevalnav Nav Veqetandek Hevalnav

Raveka Hevalnav

Hevalkar

## 2-Hevokên Rêzî

**“Nêrgizê pirtûk xwend, paqijkir, hilanî.”**

**Cûrên Hevokê**

**Riya I:**

a- Hevoka rêzî

**b-** Hevoka karî

c- Hevoka bidestûr

d- Hevoka erênî

**Endamên Hevokê**

**Riya II:**

a-Nêrgiz: Kirek

b-Pirtûk: Pêkir

c- xwend: Kar

d- Paqijkir: Kar

e- Hilanî: Kar

**“Tirampêl; hêdî hêdî dimeşe, ji ber ji tekelên wê herî dibeyî, diket çavê zarokan.”**

**Cûrên Hevokê**

**Riya I:**

a- Hevokên rêzî

b- Hevokên karî

c- Hevokên bidestûr.

d- Hevokên Erênî.

**Endamên Hevokê**

**Riya II:**

a- Dimeşe, dibeyî, diket: Kar.
b- Tirampêl: kireka hevpar
c- Hêdî, hêdî : Têrkera Hevalkarî
d- Ji ber tekelê wê: Têrkera Cihî ya neyekser
e- Herî: Kireka qaşo
f- Çavê zarokan : Têrkera Yekser

**Birepeyv**

**Riya III:**

a- Hêdî - hêdî: bire peyvên dubareye.

b- Ji ber tekel ên wê
birên A. Nav veqetandek Cînav
Palvedar Palvedêr
Palvedariya Navan
Birên Alavên Daçekî

c- Çav ê zarokan
nav V. nav
Palvedar Palvedêr
Palvedariya Navan

## 3- Hevokên Girêdayî

**"Her kes dixebitin û karê dikeve li ser milê wan dikin."**

**Cûrên Hevokê**

**Riya I:**

a- Hevokên Girêdayî
b- Hevokên karî
c- Hevokên bidestûr
d-Hevokên erênî

### Endamên Hevokê

**Riya II:**

(Hevoka I.)
a- Dixebitin: Kara demê niha kesên kom yê III.
b- Her kes: Kireka Hevpar e
(Hevoka II.)
a- Dikin: Kara demê niha kesên kom yê III.
b- Her kes: Kireka Hevpar
c-Tişta dikeve li ser milê wan: Têrkera cihî ya liserbûnê ye.

## 4- HEVOKA HEVGIRTÎ

### a- Hevokên hevgirtî yên mercî

**“Te karê berê çawa çêkirbe, vî karî jî wisa bike.”**

### Cûrên Hevokê

**Riya I:**

**a-** Hevoka hevgirtiya mercî
**b-** Hevoka karî
c- Hevoka bidestûr
d- Hevoka erênî

### Endamên Hevokê

**Riya II:**

a- Çêkirbe: Kara mercî
b- Te: Kirek
c- Karê berê: Têrkera hevalkarî
d- Çawa: Têrkera Hevalkariya pirsyarî
e- bike: Karê fermanî kesê II. Kit
f- Vî karî jî : Pêkira zêdeker
g- Wisa: Têrkera Hevalkarî

**Birepeyv**

**Riya III:**

a- Kar ê berê
Nav V. nav
P. dar P.dêr

## 6- Hevoken Bêdestûr

**“Xwend wê ew pirtûka ciwan.”**

**Cûrên Hevokê**

**Riya I:**

a- Hevoka hêsanî
b- Hevoka karî
c- Hevoka erênî
d- Hevoka bêdestûr

**Endamên Hevokê**

**Riya II:**

a- Xwend: Kar
b- Wê: Kirek
c- Ew pirtûka ciwan: Pêkir

**Birepeyv**

**Riya III:**

a- Ew pirtûk a ciwan
Hevalnav Nav veqetandek Hevalnav
Raveber Raveker
Raveka Hevalnavan

**HEVOKA NERÊNÎ**

**“Mirov birengekî nehatine vê cîhanê.”**

**Cûrên Hevokê**

**Riya I:**

a- Hevoka hêsanî
b- Hevoka karî
c- Hevoka bidestûr
d- Hevoka nerênî

**Endamên Hevokê**

**Riya II:**

a- Nehatine: Kar Nerênî kesên III.
b- Mirov: Kirek
c- Vê cîhanê: Têrkerê yekser
d- Birengekî: Têrkera Hevalkarî

**Birepeyv**

**Riya III:**

a- Vê Cîhan ê
Hevalnav Nav
Raveka Hevalnavan

## 7-Hevokên Pirsyarî

**"Kawa kengê lêborîn xwest?"**

**Cûrên Hevokê**

**Riya I:**

a- Hevoka hêsanî
b- Hevoka karî
c- Hevoka pirsyarî
d- Hevoka bidestûr

**Endamên Hevokê**

**Riya II:**

a- Kawa: Kirek
b- Xwest: Kar
c- Lêborîn: Pêkir

## PIRS

1- Hevokên li jêr çareser bikin?
Çareserkirina wan jî li gor plana jêr çareser bikin.

**PLAN**
**Riya I: Cûrên hevokê:**
**Riya II: Endamên Hevokê:**
**Riya III: Birepeyv:**
1- Di biharê de tişta xweşa mirovan tê, gul e.
2- Vê roja Newrozê ya pîroz, xirab neke.
3- Ma dara hinarê ji ya hejîrê ciwantir e?
4- Hevalê Rênas bêyî pirsa xwe ji kesê bike, pirtûk nivîsî.
5- Vê pirtûkê xwendekar pêşxistin.
6- Nalîn bihata, me dê pirtûk binivîsanda.
7- Îro Hindo çû û Rindo hat.
8- Ger nehatiba, ez jî nediçûm.

# BEŞA 5.

## DESTÛRÊN NIVÎSÎNÊ Û HÊMADANÎNÊ

### *DAXUYANÎ*

Destûrên nivîsîn û hêmadanînê ji ber me di refên Amadeyî I. II. de bifirehî daye îsal bi awayek dirêj dirêj nayê dayîn. Dema em dibêjin destûrê nivîsîna peyva rast tevayê destûrên nivîsînê tê bîra mirov. Bi hêmayên rastkirinê cudabûna wateyan, li ser hinek peyvan zêdebûna pêvekan û guhartinên piştî wê çêdibin, peyv bi hev ve yan cuda tên nivîsandin, tîpên biçûk û mezin li kûderê tên bikaranîn, kîjan navên taybet têne jimartin. Mijarên girêdayî zanista ziman in.

Piraniya şaşiyên di xebata nivîsînê de çêdibin, ji ber hêma ne di cihê xwe de yan jî ji binî nehatine bikaranîn, çêdibin. **Xal, bêhnok**, **cotxal, xalbêhnok, sêxal, nîşana pirsê, baneşan, kevanok, kevanoka bigoşe, neynok, birek, xêzika navber, xêzika axaftinê**, **xêzika xwar**, şaşiyên ji ber nezanîna bikaranîna cihê van tên holê, piranî caran wateyê wê jî bandor dikin. Her rewşenbîrek Kurd yên ku ji zimanê xwe hezdike û jê re rêz digire, dema dinivîse û dipeyve neçar e hêmadanîn, destûrên ziman û zanista zimanî li ber çav bigirin. Kesê balê bikişîne li ser van xebatan, wê bidilxweşî tên xwendin.

Li jêr pêkanînên di derbarê hêma û nivîsînê de yên bên kirin:

## A- DESTÛRÊN ZIMAN

Mijar û pendên pêşiyan bi baldarî bixwînin û şaşiyên wan yên di hêla nivîsînê de rast bikin.

### PÊKANÎNA I

→ Ti mirovan di robarek de dû caran xwe neşûştine.
→ Şaşiyên xwe em dizanin jî lê ji bo rakirina wan hewl nadin.
→ Her kes dixwaze xwe yê li hemberî xwe dost bide nîşan dan.
→ Bi rondikên çavê xwe dikarin pola jî bihêlînin.
→ Baweriya min ya biserkeftinê niha xurtir e.
→ Cîhan mîna darekê ye, em jî ji derveyî darê; weke fêkiyekê cuda çêdibine.

### PÊKANÎNA II

Di pêvajoya penaberiya me de, em li gelek cîhan geriyan û me gelek kesên baş û xirab dîtin. Lê me ji herdû aliyan jî sûd wergirt; em ji başan başiyê fêr bûn, ji xiraban; xirabî çiqas xirabe fêr bûn.

Bi vî awayî em têdigihin ku penaberiya me pir baş derbas bûye û di pêvajoya wê de em fêrî gelek tiştan bûne.

## B- HÊMADANÎN

### PÊKANÎNA I

Di nav kevanokên jêr de hêmayên pêwîst bikarbînin.

#### DARA MAZÎ

Dara mazî () darekî çiyayî ye () ji derveyî zozanên bilind () bi piranî li çiyayên Kurdistanê () tê dîtin()

Ev dar weke dara berûyê () pelên wê ji pelên berûyê biçûktir in() keskatiya pelên wê ji ya dara berûyê zelaltir in() berê vê darê yê weke mazî tên binavkirin() dermanê hindek nexweşiyan in ()

### PÊKANÎNA II

Kesek li ser rewşa biraziyê xwe wiha dipeyve(1)

Na na(2) nabe(3) divê ez biraziyê xwe biparêzim(4) ji xwe kurê min nebû(5) ev yek nebû nesîbê me(6) qet nebe divê ez li biraziyê xwe xwedî derbikevim (7) çi lo(8) çiye(9) em çilsale ji vî gelî re xizmetê dikin(10) ha binêr(11) binêr(12) binêr(13) weke din li derûdora me(14) kes û kusên din hene, bila ew jî binêrin(15) ha pora me spî bûye ji ber êşa xizmeta gel(16) ji ber vê yekê jî ew tiştên ku ez ji bo te dixwazim(17) divê ji me re zêde neyê dîtin(18)

**Li cihê van jimarên jor hêmayên pêwîst kîjan in?**

| | a | b | c | d | e | | a | b | c | d | e |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| 1 | (.) | (..) | (,) | (!) | (?) | 10 | (.) | (,) | (;) | (!) | (:) |
| 2 | (?) | (!) | (;) | (:) | (.) | 11 | (?) | (!) | (:) | (,) | (.) |
| 3 | (:) | (.) | (?) | (,) | (!) | 12 | (.) | (,) | (...) | (?) | (:) |
| 4 | (!) | (,) | (;) | (.) | (:) | 13 | (.) | (,) | (!) | (‘) | (:) |
| 5 | (.) | (,) | (;) | (...) | (:) | 14 | (.) | (:) | (;) | (,) | (...) |
| 6 | (:) | (,) | (.) | (...) | (!) | 15 | (?) | (!) | (,) | (.) | (:) |
| 7 | (,) | (;) | (.) | (...) | (:) | 16 | (,) | (.) | (;) | (:) | (...) |
| 8 | (,) | (!) | (?) | (:) | (;) | 17 | (.) | (,) | (?) | (!) | (:) |
| 9 | (.) | (:) | (?) | (!) | (,) | 18 | (.) | (:) | (,) | (;) | (!) |


Derya Res
Gurcistan
Rusya
Ermenistan
Azerbeycan
Nahcevan
Tirkiye
KURDISTAN
Iran
Suriye
Iraq
Lubnan
Derya Sipi
Idir
Qers
Sewas
Erzerom
Bazid
Agri
Mako
Caldiran
Dersim
Cewlik
Eleziz
Mus
Tetwan
Wan
Qotur
Xoy
Bitlis
Elbistan
Meleti
Firat
Farqin
Basqale
Semsur
AMED
Batman
Sert
Gever
Meras
Besni
Siverek
Merdin
Sirnex
Clemerg
Zaxo
Urmiye
Nisebin
Cizr
Entap
Riha
Veransehir
Qamislo
Dicle
Dihok
Nexede
Mihabad
Hasakeh
Musil
Hewler
Bokan
Seqiz
Bicar
Kerkuk
Silemani
Merivan
Sine
Helebce
Qesri-Sirin
Kirmansah
Xaniqen
Ilam